

ARMANC  
Ji mehê carekê  
dertê  
Hejmar : 76  
Cilleyê Paşin  
1988  
Buha: 10 Skr.  
2.5 DM

ARMANC  
Monthly  
Kurdish  
Magazine  
No : 76  
January  
1988  
Price: 10 Skr.  
2.5 DM

# Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALİZM

## Pirsa Kurda di sempozyuma Tirkologên Sovyet û Bulgaran de

**B. DIMITROVA:**  
Siyaseta ku li dijî Kurda  
tê meşandin Kurdistana  
Tirkiyê paşde hiştiye û  
ew kiriye rewşa mêtin-  
gehiyê. Di van deh salêñ  
dawiyê de di netica pêş-  
ketina aboriyê de kapi-  
talizm li Kurdistanê pêş-

ve çûye û di cîvakê de jî  
guherandin anije.

**Radoy KRASTAV:**  
Kurd netewe ne û di bin  
asîmlasiyon û qetliaman  
de jî netewatiya xwe  
diparêzin.

**I.YALIMOV:**  
Sedema ku heta iro Se-

rîhildana Şêx Seîd wek  
"îrticâî" hatiye nîşandan  
xeletiya PKT ye. Şefik  
Husnî di rapora xwe ya  
Kominternê de digot "Ji  
berku ev serîhildan li dijî  
Kemalizmê ye, loma jî  
paşverû ye"

Blagoev, B. Marinkov, D. Nedev,  
A. Garabedian, P. Parashkev û Kur  
dologe Bulgar R.Kraстав hazirbûn.  
Di Sempozyumê de 13 tewir  
rapor li ser Tirkiyê hat xwendin. Di  
nav wana de ya herî girîng a bi navê  
"Siyaseta burjuaziyê Tirk li ser  
pirsa netewî" bû. Ew babet ji alî  
Boryana Dimitrova pêşkêşî sem-  
pozyumê bû. B. Dimitrova bi kurtî  
di rapora xwe de digot "Di salêñ  
1970 û 1980' an de di nav pirsê

Dûmahîk r. 11

Em sala nû ya hemû  
xwendevanen xwe  
ji dil û can pîroz dîkin !  
**ARMANC**

## konferans li ser dîroka surgûniya Kurdan



Dr. Kemal Fuad (yê li milê çepê) di konferansê de diaxife

Li paytextê Danîmarka li Kopenhagê bi  
navê "Li Kurdistanê Surgûn" konferanse  
hat dayîn. Di konferansê de li ser surgûna  
Kurdan û îşkanen mecbûrî hat sekinandin.

Li Ewrûpayê ev cara pêşin e ku di vi warî de  
xebat tê çekirin û koferansek tê dayîn.

Di pêncê meha Kanûnê (5.12.87)  
de li Danîmarka, li bajarê Kopen-  
hagê Komîta Piştgiriya Kurdistan û  
Komîta Yekîtiya-Çep bi hev re di  
bin navê, "Li Kurdistanê Surgûn"  
konferansê çekirin. Komîta Pişt-

Dûmahîk r. 11

## Hukûmeta Bonnê ji bo Kurda otonomiyê dixwaze

"Pirsa Kurda ji bo NATO  
barekî politik e. Mafê insanî  
demokrasî û azadî ew tiştên  
ku NATO pirr qîmetê didê û  
ew sedeme dibê ku Tirkiyê  
pirsa Kurdi bî aşîti hal bike.  
Bi kîmasî ji bo Kurda aşîti-  
yek wilo û otonomiyâ çandî  
dibê bê xwestin"

Di 4 çileyê Pêşî di organa  
mehaniya Wezirê Parastina Al-  
manya Federal de bi navê "Kurdistan" meqaleyek hat weşandin. Ji  
ber ku Wezirê Parastina Almanya  
Federal sekretê gişî yê NATO yê  
ye jî loma jî ew dîtin wek dîtinek  
NATO yê dikare bê hesabkirin.

Kovarê ji xeynî meqalê cî daye  
xerîteyek Kurdistanê û li ser hej-  
mara, serhîldanen Kurdan, ziman û  
rewşa wan sekiniye û bi kurtî wilo  
dibêje.. "Heta iro her çiqas Tirkiyê  
pirsa Kurda inkarkiriye jî lê bi rasti  
pirsa Kurdistanê heye û ev pirs ji bo



eskerî hat guhartin û bend li ber  
partiyan hatin danîn. Li gor qanûnê  
ji bo ku partiye karibe têkeve  
parlamentoye, divê li temamî

Tirkiyê ji %10'ê dengan bistîne. Ku  
ne wiha be ew, li herêmekê an bajar-  
ekî ji %100'ê dengan jî bistîne

Dûmahîk r. 11

Nivis di hejmara bê de

**Heppevîn bi Sosyolog  
M. Van Bruinessen re**

Ev yeka han ji encama sistêma  
qanûna helbijartinan a Tirkiyê tê.  
Qanûna helbijartinan pişî derba

## Rejîva Mejhî

## Encama hilbijartinê...

Di encama ( netica) hilbijartinên Tirkîyê yên parlementoyê de, partiya Turgut Ozal. (Serokwezir û şirîk diktatoriya 12'ê ilonê) ji 450 miletwekiliyan (mebûsan ) 292 girtin û cardin imkana commandina ser hukum dit.

Turgut Ozal, şirîk diktatoriya faşist a 12'ê ilonê bû, di dewra generalan de cîgirê Serokwezir bû û aqilmendê diktatoriye yê karûbare aborî bû. Înbêkarî, feqîrtî û birçibûna ku anîn nav milet yek jê ji ew bû. Li ser hesabê emperyalizma Amerika û monopolên dewlemendê Tirk xwîna miletê karkir û rîncber û xebatkar kîşand. Di 1983'ya de partiya ANAP'ê dani û hat ser hu kum ev çar sal bûn ku hukumet a pertiya wî bû. Üvê zilm û zor û xwînmêjîya çar salan raste-rast hukumeta wî kiribû. Lî gelo çawa bû ku cardin piraniya ( ji sîsiya duduyê ) parlementeran wi girt û hat ser hukum.

Yek jê ew e ku, her ci hin partiyen burjuwazî iro serbest bûne ji lê disa ji rejîma diktatoriye bî damûdezeugen xwe yên esasi xwe dimeşîne. Wek hemû qanûnê din qanûna partiyen siyasi û ya hilbijartinan, bi her awayî nedomokratik e. Rê nade partiyen çep û yên mafêni gelê Kurd diparêzin bêñ avakirin. Imkan tuneye ku partiyen heyî ji baş xwe bîghînîn millet wan bîcîvînîn ser hev, milet têxîn xebata rîxistîni. Mîleteki bê rîxistîn wekî kerîye pez e. Li hemberî vê sazûman û darûdezga dewletê, radio televîziyon hemû ji propaganda rejîma serdest re û ji Turgut Ozal re dişxuli. Qaidê helbijartinan ji du sê qat bi bend bûn. Yanî rewşa rejîm û awayê helbijartina wiha hatibû avakirin ku berî hilbijartina ji herkesi zanibû ku wê partiya Turgut Ozal bê "hilbijartîn."

Lê li alî din, vê partiya wan 292 parlementeran bi %36'ê dengdayan girt. Ji 1/3'ê dengan girt lê 2/3 yê parlementeran qezencî kir. Ji % 64'ê dengan li dijî hukum rengê xwe dan nişandan. Nedemokrattyâ rewşê û awayê hilbijartîn di vir de ji xwiya kir.

Lê xwiya ye ku herçi piraniya milet dengê xwe nedan Ozal, nedan partiyen çep ( en Sosyaldemokrat ) ji. Piraniyen dengan çûn ji partiyen baskê rast re. Ev ji ji wê yekê tê ku, Sosyaldemokrat bi bîr û bawerî, program, iştikrar û mîrxasiya xwe nikarin bawerîyê bidin milet di van karan hemûyan de qels in, sist in. Li alî din hêzîn çep ên şoresger ên Kurd û Tirk ji pişti 12 ilonê hê pişta xwe rast nekîrine, neketine nav millet û milet li dora xwe ne ctvandine. Dengê wan naçe millet û millet dibin hela hela û gurme gurma "def û zirna" diktatoriye de gej bûye. Ber û guhê milet çûye ber bi cîyekî din. Di rewşek wiha de helbet encama hilbijartinan, wê ev be û ev ji ne tişteki ecêb û xerîb e. "Miletê bê rîxistîn mîleteki kole (esir) ve."

## Hesekê:

## 20 karkerê Kurd mafê xwe diparêzin

20 karkeren Şerîka El-Resafa li Hesekê, giliyê xwe li cem Wezîrê Avabûn û Lêkirinê kirin.

Di sala 1962'an de li herê- paşde bigren hîn ji ecnebî ne, ma Cizîrê li Kurdistana Sûriyê, dewletê hejmartinek taybetî pêkanî. Li gor wê hejmartinek nêzî 150 hezar Kurdi nifûsîn wan jê hatin stendin û di welatê xwe da bûn ecnebî (biyanî). Di nava salan de (25 sal) hinekan bi bertîlan û hewayê din nifûsîn xwe paşde girtin. Lî piraniya e-wênu ku nikaribûn nifûsa xwe

Rojnama Partiya Komu

nîst a Sûriyê "Nidal EL-Şaab" di hejmara 407'an de, Çiriya Paşa 1987, wiha nîviye:

Di roja 28.10.1987'an de, 20 karkeren Şerîka El-Resafa ya lêkirin û avahîyê-perçê avdanê, li Hesekê, giliyê xwe li cem Wezîrê Avabûn û Lêkirinê kirin. Di nama xwe de, (No: 6118/32), ew karker dibêjin, wekî ji destpêkê û heta niha, ji berî kişandina nifûsîn wan, ew ji hemû qezan cênu, hevallîn wan girtine, bêpar manin.. Ew doza mafê xwe dikin ji wana hinek ev in:

1- Bêparbûn ji her du zêdekirinê meaşen salen 1985/1987.

2- Bêparbûna ji mafê xwe yê bicikirinê ya kar. Heta nuha ew yan karkiên rojane, yan ji yên salane ne û her dikarin ji kar bêñ avêtin.

3- Bêparbûna mafê wan yê endametiya nîqaban (sendikan). Ew nikarin bibin endamê tu nîqaban.

4- Wek malbatî bêparbûna imkanen doktor û nexwes-xanê.

5- Bêparbûna ji hemû qanûnên civakî.

Şeva 18-19'ê Çiriya paşa Şêxmûse lawê Mihemedê Reş (Şêxoyê Dînik) ji gundê Girbawî diçe Qamîşlo mala xweha xwe ya li taxa nêzîkî hudûd. Berê vira ji gund bû û navê wî ji "Hilîlî" bû, lê nuha bajar gîhiştiye wir. Şêxo ji ber ku aqilê wî ji hinekî ne temam e û wext ji şeve riya mala xweha xwe wenda dike û rast berê xwe dide elektrîkî tixûb.

Bi gîhiştina ber têla hudûd leşkeren dewleta kolonyalist lê direşmin, hûr û rûviyê wî berra

## Qamîşlo:

## Leşkeren Tirk cardin xwîn rijandin

erdê didin.

Pişti vê hovîtiyê termê Şêxoyê dînik du roja li ber tuxûb dîmîne û kes newêre here ser. Di dûre heyetek keşfî ji Tirkîyê tê, ew û heyeta Sûri bi hev re otopsiyê dikin û meyt radikin Hese-

ke. Leşkeren Tirk yêntixûb ev ne cara pêsiye ku bi vê hovîtiyê meriva gulebaran dike, berê ji çend caran bi vî rengî gelek kes (Heta, yekcarna dewar ji) kuştine.

## Raxistinek dokumentarı



Di meha çiriya paşa 1987'an de li paytaxta Bulgaristanê Sofyayê bi navê "Jenositî siyaseta sistematiqa dewleta İmparatoriya Osmaniî û Komara Tirkîyê" raxisti-

nek hat vekirin. Raxistin ji alî ajansa Sofya Press de hat organizekîrin û geleki bala milet kîşand.

Di vekirina raxistinê de direktörê ajansa Sofya Press

Stefan Petrov di xaxftina xwe de bi kurtî wisa digot "Şert e divê neyê jîbirkirin ku, İmparatoriya Osmaniî nêzîkî 500 sali siyasetek jenosit li dijî gelên ne

## Deng û bahs ji Kurdistana Sûriyê

1- Bêparbûn ji her du zêdekirinê meaşen salen 1985/1987.

2- Bêparbûna ji mafê xwe yê bicikirinê ya kar. Heta nuha ew yan karkiên rojane, yan ji yên salane ne û her dikarin ji kar bêñ avêtin.

3- Bêparbûna mafê wan yê endametiya nîqaban (sendikan). Ew nikarin bibin endamê tu nîqaban.

4- Wek malbatî bêparbûna imkanen doktor û nexwes-xanê.

5- Bêparbûna ji hemû qanûnên civakî.

Serten Abonetiyê:  
Salek 120 Skr, 30 DM.  
Şeş meh Skr, 15 DM.

Xwedi / Issued by  
Yekîtiya Karkeren Demokraten Kurdistane  
The Demokratic Union of Kurdish Workers

# Şeva musabaka govendê bû şahiyek mezin

Li dora 1300 Kurd bi komikên govendê re kêt û heyecan derbas kirin. Ji cur bi cur folklorên herêma leystik hatin pêşkêşkirin.

Roja 20'ê Çileyê Pêşî ya 1987'a ji aliyê Federasyona Komelêne Kurdistanê li Swêd, li Stockholmê musabaka folklorê (govend) hat hazirkirin. 7 komê folklorê besdarî musabakê bûn. Ev komên folklorê: Komên folklorê ên komelêne Kurd li Sundsvall, Bolnes û ya jina, koma Govend, Sîpan, Dîlan û Sulav bûn. Her çiqas koma Ararat, Şengal û Komela Kurden Goteborgê muracat kiribûn jî ni-karibûn besdarî şevê bivin.

Federasyonê berî 4-5 meha agahdariya musabaka folklorê dabû. Ji bo koma ku bibe yekê 5.000 Kr., ya duduya 3.000 Kr. û ya sissiya jî 1.000 Kr. xelat danibû. Ji bo puandayina musabakê jî ji aliyê federas-

Di nav heft komikên folklorê de Koma Govend bû ya yeka, Koma Dîlan bû ya duduya û Koma Jina jî bû ya sisiya.



Koma Govend di musabakê de bû yekem

yonê jûriyek hatibû rin, bi sedan jin, mîr û zarok xwe avêtin pîstê (sahnê) li ber muzîk û dengê Şivan û Gulistanê bi eşq û kîfek mezin xwe hejandin.

Her komek folklorê leystikên herêmekê pêşkêş kir; Entab, Diyarbekir, Hekarî û ji Kurdistana Iraqê û Îranê û h.w.d. Li dorî 1300 Kurd bi balkêşiyek mezin û bi kêt û eşq li komên folklorê mîze kirin. Di navbera de jî Şivan û Gulistanê bi deng û muzîka xwe te-mâsevana anîn eşqê. Piştî komên folklorê leystikê xwe pêşkêşkirin.

## Ozal zinarek gêrri ser gel kir

Hêkek bû 90, nanek bû 150 lîre

Piştî van zemên dawiyê hin mirovan xwestin wî destê xwe yê ray dabû Ozal jêkin.

Li Tirkîyê, du roj piştî hilbijartina nûnerên parlamentoye, hukûmeta Turgut Ozal her tişt carek din buha kir. Ev zemên (buhayîyen) Ozal, mîna zinarekî mezin gêrî ser gel bû û gel pelixand. Di navbera %6-60 zem hat ser her tiştî. Hêkek bû 90 lîre, nanek bû 150 lîre, lîtrak sîr bû 850 lîre û paketê Maltepe 350 lîre. Bi van zeman dewlemeden Tirkîyê hîn dewlementir û xizantir bîn. Perên ku bi buhakirina tiştan hatin ser hev, cûn bêrîka Koç û Sabancı (dewlementirînên Tirkîyê).

Wek tê zanîn ji 24'ê Çileyê Paşîn 1980'î û vir de, bi reçeta IMF (Fona Pera a

Navnetewî) û Banka Dinê programeke aborî li Tirkîyê tê meşandin. Ji bo bi cianîna vê programê berpirsyarê yekem Turgut Ozal bû. Naveroka vê reçeta IMF'ê dibê dewlernend, hîn dewlementir û xizan jî hîn xizantir bîn. Ji xwe ji sebebên hatina cûnta faşist yek jî hîn serbestir bikaranîna vê programa aborî ya IMF bû. Ji ber ku ev programa li tu welaş bêî hebûna diktatoriyeke nehatîye meşandin. Ev zemên piştî hilbijartîn jî perçakî vê programê ne.

Van zeman per û pûçikê (baskê) gel şikandin. Edî gel nikare nan û pîvazê ji bikire.

Cend mînak (numûne) ji tiştîn ku buha bûne.

Navê tiştî

**Roja hilbijartînê**  
(29.11.1987)

**2 roj piştî hil.**  
(1.12.1987)

Tonek kaxetê rojnama	410 500 TL.
Jetonek piçûk	50 TL.
Jetonek mezin	750 TL.
Lîtrak benzîn	278.20 TL.
Elektirîk (KW)	35.50 TL.
Paketek Samsûn	300 TL.
Nanek	100 TL.
Lîtrak sîr	650 TL.
Kilo şekirê çayê	300 TL.
Kiloc çay	1 800 TL.
Kiloc göst	3 800 TL.
Kiloc penêr	1 950 TL.

600 000 TL.
75 TL.
1 125 TL.
350.90 TL.
42.00 TL.
350 TL.
150 TL.
850 TL.
420 TL.
3 500 TL.
4 000 TL.
3 000 TL.

## Nûçeyên KKDK

### KKDK ji bo mafê gelê Kurd meşîya

Bila netewê Kurd qedera xwe bi destê xwe tayînbike

Bila muhacirkirina Kurdan bê seknandin

Bila cezayê idamkirinê rabe

Em waliyê mîtingehkar naxwazin

Efuya umûmî ji bo hemû girtiyên politik

Ji bo van daxwazan KKDK'ê di 5.XII.1987'an de li bajarê Bochumê meşek û mitîngek çêkir.

Zêdetirî 400 kêsên şoreşger û welatparêzên Kurd tevî meşê û mitîngê bûn. Berî meşê, bi zimanê Almanî li ser rewşa Kurdistanê a iroyîn xeberdan hate kirin. Di dema xeberdanê de bi Almanî, Kurdi û Tirkî slogan dihatin avêtin. Bimre koletî, bijî serxwebûna Kurdistan, bila leşkerê Tirk ji

Kurdistanê derkeve, em waliyê mîtingehkar naxwazin, bijî Partiya Pêşeng, bila zîndan vala bibin, efuya umûmî hwd.

Di dawîya meşê de mitîngek li ber meydana devê derê belediya bajarê Bochumê çêbû. Deqîkakê di huzura şêhidîn serxwebûn û azadiyê de seknîn û bi navê merkeza KKDK axfantek hate kirin. Meş û mitîng bi moralekî bilind û bi disiplin xilas bû.



KKDK di kongra SPD da

Şileswig-Armanc

Kongra SPD (Partiya Sosyaldemokrat a Almanya) a Şileswig-Holstayin di 20/21.11.1987 de li bajarê Kielê çêbû. Gelek

heyeîn bi navê partiyê sosyalist û sosyaldemokrat ji welatê Avrupa Bakur wek Norveç, Danîmarka, Swêd û hwd. hatibûn dawetkirin. KKDK ji wek rîexistineke demokratik dawetî kongra SPD'ê bû û di mesaja xwe de wiha digot: Rejîma generalan hebûna 12 mîlyon Kurd, dîroka wan, zimanê wan û kultura wan inkar dike. Ji bo vê armancê politikake jenosidî dimesîne.

Dîktatorîya generalan dixwaze bi 100 hezaran Kurdan ji Kurdistanê bi darê zorê bajo Rojavayê Tirkîyê.

KKDK di dawîya mesaja xwe de got, ku iro nêzi 350.000 Kurd li Almanya Federal dijîn. lê tu mafêwan wek yê biyaniyê din nîne. Van mafan naxwazin bidin Kurdan ji ber ku Tirkîyê endamê NATO ye. KKDK ji bo wan mafêwan Kurdan li Almanya Federal têkoşînê dide û ji bo vê yekê ji Kongra SPD'ê piştigirî û alîkariyê dixwaze.

### KKDK doza gelê Kurd dide naskirinê

Makarzew û Kabannîkov: Li Kurdistanê pêşveçûnek pêşverû û antî-emperyalist heye. Em vê tevgerê bi tevayî silav dikan...

SDAJ, Rîexistina Xortan ya Partiya Komunîst a Alman (DKP) li ser prestroyka û glasnost'ê di 6'ê Cotmehê de li bajarê Lubeckê civînek çêkir. Serokkonsilosê Sovyet yê Hamburgê Juri Makerzew û serekê Komsomolê Andre Kabannîkov ji hatibûn dawetkirin.

Di civînê de endamê Komîta KKDK ya Lûbeckê keys dît ku bi van her du mîvanan resohbet bike û ji wan hin pîrsa bipirse.

Li ser Kurdistanê, têkoşîna gelê Kurd û rewşa iro û li ser Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK) bi kurtayî hin informasyon hat dayîn û hin pîrs hat pîrsin. Makarzew û Kabannîkov ji di bersîvîn xwe de gotin ku: "Li Kurdistanê tevgerek pêşverû û antî-emperyalist heye. Em vê tevgerê bi tevayî silav dikan. Lî hêzîn me (qewetîn me) pîr belav in.

### Cûntayê serekên PYKT avêtin girtîgehê

Di 7'ê Çirya Pêşî 1987'an de di preskonferansa Brûkselê de sekreterê giştîya PYKT Heyder Kutlu û seraka PYKT(TIP) Behice Boran (ku roja 10'ê çirya pêş çû heqîya xwe) dabûn flankirin ku, di bin navê Partiya Komunîst a Yekbûyî ya Tirkîyê (PYKT) de hêzîn xwe wê bikin yek.

Di 16'ê Çirya Pêşî de sekreterê giştî yê PYKT H. Kutlu û sekreterê PYKT (TIP) Nihat Sargin ji bo ku, Partiya Komunîst a Yekbûyî ya Tirkîyê bi fermî avabikin, bi grûbek parlamente, rojnamevan, avûqat û h.w.d. yên Ewrûpî re çûbûn Tirkîyê. Wexta li Enquerê ji balafirê peyabûbûn ji ali polisan ve hatibûn girtin, 20 rojan di bin çavan de mabûn û işkence ditibûn.

Di 6'ê Çirya Pêşî de Mahkema Dewletê ya Ewlîkarî (Emnê) ji bo damezrandina û idarekirina partiya komunîst a ilegal, ji bo xebata wan ya li diji Tirkîyê, serekê dewletê û meclis û ordiya Tirkîyê di heqê H. Kutlu û N.

Sargin de dawa vakir û ew avêtin girtîgehê.

Berî û piştî ku Kutlu û Sargin veerin Tirkîyê atmosfera politik bilind bû. "Serokkomarê" Tirkîyê Kenan Evren ji bo serbestkirina Partiya Komunîst digot ku "Wexta ew ji derwe direkifî nesûn û wek komunîsten Ewrûpî bibin, wê gavê belkî ev parti bê serbestkirin. Lî belê vegera wan provakasiyon e"

Serokwezîrê Tirkîyê Turgut Ozal ji wek Evren difikirî û digot "H. Kutlu û N. Sargin ji bo provakasiyonê hatine û dixwazin danûstendina Tirkîyê bi Civata Aborî ya Ewrûpayê re xirab bikin".

## RAMANÊN RAMANWERAN

# Di programên partiyê legal ên çepê Tirkîyê de Pirsa Kurdi

Wek tê zanîn eger " milletek, ku milletekî din bindest bike, ew jî ne azade" ev prensîba esasî, bi dev jî alî hemû hêzên sosyalist û çepê dinê ve tê qebûl kirin. Lê çi faydye ku hinek ji van hêzan, ji bo vê prensîba ilmî têkoşin bê hempa didin. Û ên dinjî ji bo vê prensîbê têkoşinê nadîn, an jî di têkoşinê da pîr qels dimîn. Wexta ku ev durrûtî tê munaqaşekirin, ji bo xwe "paqîj" derxînin gelek sebebê nesebeb rê din.

Di xebata legal de durûtî hîn zêde dibe. Li gor sînorêن qanûnan programan qedikin û gelek caran sînoranjî ji alî xwe ve teng dikin. Tîştîn ku kanin werin gotin, ji tirsa qanûnan nayên gotin, û wusa rastîyên ilmî ji qanûnen "resmî" re tê qurban kirin.

Di meselaya milletê Kurd da di nav hêzên sosyalist û çepê Tirkan de jî nexweşiyêن ku li jor hatin gotin, hene. Wexta ku em li dîroka tevgera çepê Tirkan dinêrin, ne tenê di têkoşina legal de, di a illegal de jî gelek şâşitîyêن wan hene.

Ne dûr, berî nuha deh panzdeh sal berê, partî û hêzên çepê Tirkan digotin Kurd ne milletin, bes grûbek millî ne. Yanî wek Lazan, Ereban û Çerkezan. Dîtina wan ev bû. Bi têkoşina hêz û partiyên welatparêzên Kurdistanê hinek şâşitî hatin guhertin. Îcar gotin: "Erê milletê Kurd heye, lê dibê şoreşer û welatparêzên Kurd partiyê cihê çê nekin, di nav partiyê me de cih bigrin. Rizgariya gelê Kurd girêdayî şoreşa Tirkîyê". Û ev dîtin hîn jî tê parastin. Di nav partiyên legal ê çepê Tirkan de Kurd wek grûbek millî jî nayê qebûl kirin. Ji 1919 an heta 1978'a bi navê çep û sosyalistî 9 partî hatine damezirandin, lê qet partiyekê jî di programa xwe da bahsa milletê Kurd nekiriye, - di programa yekê de bêjeya "Kurd" heye, lê di maneke wusa de xebitandiye ku, Kurd bêtir di herêma Rojhilata Navîn de tê famkirin- bes hinekan çend bêjeyen giştî nivisandine. Ji 1984' an virde xebata ku jibo damezirandina "partiyek sosyalist" tê kirin jî nîşan dide ku, hîn dîtinê kevn tê parastin.

Li ser van meseleyan gelek munqaşê bûne û hîn jî dewam dikin. Îro çepê Tirkâ, ji bo damezirandina partî, an partiyên legal xebatê dikin. Ji bo ku şâşitîyê hîn dom dîkin berbiçav bin, hewceye ku şâşitîyê dîrokî bêngotin û eşkere bibin. Ji bo vê yekê, em dixwazin di vê nivîsa xwe de di programên partiyên legal ên çepê Tirkan de meseleya Kurdi çawa hatiye ziman, an bi gotineke din, çawa nehatîye zimên, care ke din raxin ber çavan.

## ÇI DIBÊJIN?

Partiya ku, ji alî Şefik Hûsnu, Ethem Nejat û çend hevalên wan ve di 1919'an de bi navê "Türkiye İşçi ve Çiftçi Sosyalist Fırkası TİÇSF (Fırqeya Sosyalist a Karkerû Cotkarê Tirkîyê) hatiye damezirandin, di programa xwe da ne vekirî û ne jî bi bêjeyen giştî cî nedaye meselaya Kurdi û gruben millî yê din. Wek tê zanîn wê wextê meselaya milletan bi qanûnan nehatibû (yasaxkirin) qedexekirin. M. Kemal bi xwe, bi dev be jî meselaya Kurdi qebûl dikir. Ronakbîrên Kurda kovar derdixtin û xebata komelî dimeşandin. Eşkereye ku xeletî di dîtina partiyê da bû. Û vê xeletiya dewam kir. Piştre Partiya Komünist a Tirkîyê çê bû. §.

Behram Arda

Hûsnû û E. Nejat di nav vê partiyê da jî cî girtin. E. Nejat, bi grûba M. Suphî re ji alî kemalistan di 1921' an de hat qetikirin. Ş. Hûsnu, bi salan partiya komünist di Enternasyonal Sisiyan de timşîl kir, li ser serfîhîdanen gelê Kurd malûmaten ne rast û çewt da Enternasyonal Sisiyan û li gor van malûmatan biryarêñ çewt hatin girtin. Ev partî di sala 1924' an de hat fesikhîrin.

Cepê Tirkan di salên 1920'î û 30'î da jî, ji tevgera millî a Kurd dûr bûn. Bi çavên Kemalîstan li tevgera Kurdi dinêrin. Ji bo vê yekê jî li hember serfîhîdanen gelê Kurd sekînîn, tevgera millî a Kurdan bi keyneperstî û bi hevalbenîya emperyalîstan îtham kirin. Him gelê Kurd û him jî gelê Tirk ji van çewtiyan zîrât dîtin.

Pişti ku Tirkîyê dest bi "sistema pir-partî" kir, Ş. Hûsnû û 7 hevalen wî, di 1946' an de bi navê "Türkiye Sosyalist Emeçî ve Koylû Partisi - TSEKP." (Partiya Sosyalist a Xebatkar û Gundiyê Tirkîyê) partiyek damezirandin. Partî pişti 6 meha ji alî Urfî idareya İstenbolê hat girtin. Di programma partiyê da du madde li ser "meseleya gruben millî" hebû. Navên gruban vekirî nehatibû gelê me, girêdayî şoreşa Tirkîyê dibîne. Maddeya 44' a li ser wek-heviya welatiyan (vatandaşların eşitliği) bû. Maddeya 45' li ser, "pêşverbîna çanda millî û di nav idareya mahalî û meclîsa millî da temsîlkirina gruben millî" bû. Bi çavekî "etnîkî" be jî, li gor 1919' an dîtina vê programê gaveke bi pêş de bû. Lê hîn ji nîrîna çep û sosyalistî dûr bû. Mafê çarenûsî (qedera xwe bi destê xwe tayinkirin) nedihat parastin.

Di sala 1946' an de partiyek din jî hatibû damezirandin. Navê partiyê "Türkiye Sosyalist Partisi- TSP- (partiya Sosyalist a Tirkîyê) bû. Di programma partiyê de ne meselaya gelê Kurd ne jî meselaya "gruben millî" hebû. Her tiştji bo "milletê Tirk" bû. Tenê maddeya 15' a wek qanûna esasyê bû. Wek tê zanîn, ji qanûna esasya 1924' an heta qanûna esasya 1982' an maddeyekê hertim cî girtiye. Ev jî, "wekheviya welatiyan" e. Ev partî jî pişti 6 meha hate girtin.

Partiya ku 1954' an de bi navê "Vatan Partisi - VP- (Partiya Welat) hatiye damezirandin, ew jî qet behsa meselaya Kurdi an meselaya gruben millî nake. Ruhê "Kuvvayî millî" diparêze û pesnîn 6 xetîn Partuya Komarî a Gel (CHP) dide.

Ji alî hinek serokên sendiqayê karokeran ve di 1961' an de "Turkiye İşçi Partisi- TIP- (Partiya Karkerê Tirkîyê) hate damezirandin. Di 1971' an de hat girtin. Programa vê partiyê, berde behskirina meselaya Kurdi an meselaya "gruben millî", kesen ku di nav sînorân devleta Tirkîyê da dijîn, ji gîşan re "dibêje Tirk". Armanca parastina qanûna Esasiya 1961' an dike ber xwe, "Mîsakî Millî" diparêze. Gor programma partiyê, partiya çîna karkerû tebaqayênen xebatkarê din û ronakbîrê Tirk e; û "kesen ku bi benê welatî girêdayî dewleta Tirkîyê ne, hemû Tirk in". Bi rastî ev partî ji sosyalizm pîrtir di bin tesîra Kemalizm de ye. Ji xwe di programê de tê nivisandin ku partî, partiya ronakbîrê Kemalîst e. programma TIP ê wusa be jî, pişti çend sala dest bi "meselaya rojhîlat" kir. Di "mitîngîn

Rojhilat" (Dogu Mitingleri) da cî girt. Di kongra 4' an de (Çîrya Pêşî 19709 li ser mesela Kurdi hinek biryar hatin standin. Ev biryar bûn sebebekî girtina partiyê.

Partiya ku di 1974' an de bi navê "Turkiye Sosyalist İşçi Partisi-TSIP- (Partiya Sosyalist a Karkerê Tirkîyê) hat damezirandin jî, di der heqê, mesela Kurdi de tiştekî nû nedanî. Gor programê mafê çarenûsî wek prensîbekî siyaseta derive bû. Wexta ku yek vê programê bixwîne, famnake kunuqteya mafê çarenûsî jîbo gelê Kurd hatiye nivîsandin, Tenê di qismê "daxwazîn acîl" de nuqtake li dijî şovenîyê (nijadperestiyê) heye. Ew jî wusaye; "sekinandina polîtîqa jenosidî û asîmîlasyonê û her wusa sekinandina hemû tahde û kiranîn şovenî û nijadperestî; rakirina hemû benden li hember pêşveçûna azad". Meriv kare bêjî ku ji tunebûnê çetire. Lî ji nerîna sosyalistî hîn dûre. Ev partiyâ han jî pişti cûntaya 12' ê llonê hat yasaxkirin. Pişte yasaxkirinê bi navê partiyê dest bî mesela Kurdi kirin. Ev jî wek partiyê din rizgariya gelê me, girêdayî şoreşa Tirkîyê dibîne.

"Türkiye Emekçi Partisi- TEP- (Partiya Kedkarênn Tirkîyê) 1975 an de hat damezirandin. Cara yekemîn bêjeya "Kurd" di nav programma vê partiyê de derbas dibe. Wek me li jor jî got, ev behskirin nayê wê manê ku ew behsa Kurdîn di bindestê Tirkîyê de ne dikin. Partî, tasfiyekirina polîtîkayên asîmîlasyonîst û şovenî jî diparêze. Ji bo kesen ku zimanê diya wan (zimanê Zîkmakî) ne Tirkîyê, dibê ziman û çanda wan bê fêrkirin. Di hinek ciya de behsa "gelê Tirkîyê" "çanda şoreşerî û millî" dike. Carna jî meselaya Kurdi, Wek meselaya "newekheviya herêmî" (bolgesel eşit sizlik) dibîne. Yanî dîtinek tevliheve; ne bi ser û bere. Dîvê programê de jî mesela Kurdi wek meselake millî nayê qebûlîn. Di sala 1975' an de ji nuh ve dameziandina Partiya Karkerê Tirkîyê jî ji bo meselaya Kurdi tiştîn esasî nanî. Sebebîn paşdamayina Kurdistanê qebûl nekir û "newekheviya herêmî" sebeb rî da. Biryara kongra 4' an (çîrya pêşî 1970) li ser meseleya Kurdi, ji "bîra kirin". Tenê daxwaza "sekinandina polîtîka û kiranîn şovenî û nijadperestî" di programma partiyê da hebû. Di qismê merhelaya Sosyalizmî da jî tiştekî li ser meseleya Kurdi, an meselaya "gruben millî" tunebû. Partî di 12' ê llonê de hat girtin. Pişti vê girtinê, wê jî wek partiyê din vekirî dest bi meselaya Kurdi kir. Berî viya bi demakê bi Partiya Komünist a Tirkîyê re bîrîya yekîtiyê girt. Û bi navê "Partiya Yekbûyi a Komünîstîn Tirkîyê" (TBKP) pêşniyarek programê derxistin. Di vê pêşniyara programê de meselaya Kurdi gelek hatiye behskirin. Lî şâşitîya mezin cardin domdike. Li gor programê Rizgariya Kurdistanê girêdayî Şoreşa Tirkîyê û bê vê riyê Kurd nikanin rizgariya xwe bi destxin. Ji bo rizgariya Kurdan riya "demoqratîk û aştî" tê pêşniyarkirin.

"Sosyalist Devrim Partisi- SDP- (Partiya Şoreşa Sosyalist) di sala 1975 an de hat damezirandin. Li gor

## Stiriyê me

Lawikê Berrîvanî

## DI TEŞBÎHÊ DE XETA TUNEYE...

Li Tirkîyê mudaxela generalen faşist ya 12'ê llonê wek ku tê gotin zîrât neda her kesî, gelek kesî jî jê karek mezin dît; ji wan re bû wek "toto", ya jî wek bilîtek "millî piyangô" (ya nesîb) lêxe. Ew kesen ku heta şeva 12'ê llonê bes "peyê" mala xwe û li ser karê xwe bûn, diçûn mekteba xwe, ya jî li kuçan tirral tirral digeriyan û jîyanek bê deng û basit derbas dikirin, pişti 04.00'ê şeva 12'ê llona 1980'î jîyanâ wan hat guherandin û bi carê de (bi derbekê de) deriyê "şairî" û "nivîskariyê" li wan vebû û bûn "ronakbîrê" gelê Kurd...

"Di teşbîhê de xeta tuneye", derba 12'ê llonê bi mana dewlemendiyê erê kes nekir milyoner, lê ew kîrin tiştekî ji wê jî muhîmtir û baştir: "şair", "nivîskar" û "ronakbîrê Kurd". Bê gumman van navana (wasif) ji milyonê "toto" û "bilîtek" gelekî hêjatir e.

Bi tecrûba jiyanê me dîtiye ku mal (serwet, pere) qirêja destâ ye, iro heye sibe tuneye... Lî "şairî", "nivîskarî" û "ronakbîrî"? Ma ew jî wisa ye? Bê guman ne wisa ye. Pişti ku meriv xwe "şair, nivîskar, edip û "ronakbîrê Kurd" bihesibîne êdî mesele diqede, di pê re meriv tazî bikin û bi deh qalib sabûna Reqayê jî bişon cardin ji nikarin wî "navê şîrîn" (nivîskar û ronakbîrê Kurd) ji ser meriv rakin. Lî bi wî şertî ku di her fîrsendê de merivê bibêje: "Em nivîskar û ronakbîrê Kurd..." Ji bo "nivîskar" û "ronakbîrî" ev geleki muhîm e... Ji ber ku tu pîvanek umûmî tuneye ku meriv "nivîskar" û "ronakbîrî" pişti 12'ê llonê pê bipive û li gor wê pîvanek qîmetekî bidê...

Lî wê bê gotin ku çaxa yek bi rastî ne şair û nivîskar be, heta jê tê bira (bila) ji xwe re bibêje ez nivîskar im, tu kesî wî wisa qebûl neke. "Nivîskar e, ya ne nivîskar e wê jî alî xwendevanan ve derkeve ortê". Dîtinek wisa jî "dibê meriv pirr guh nedê". Wek nivîskarekî Tirk jî gotibû:

- Heger carê yek xwe nivîskar, şair û edip bihesibîne edî tu mesele namîne. Pişti ku wî xwe nivîskar qebûl kir êdî ew hew tê zeftê. Pirr ya jî hindik, li gor xwe muheqeq wê jî xwe re xwendevana bibîne...

Hinek wê bi niyeta gotinê pena-pûci (gotinê vala) yê dînekî bixwîne, hinek jî ji meraq û hezkirina gotinê mezin bixwîne, wê bibêje muheqeq hîkmetek di van gotinan de heye, loma jî dibê ez bixwînim. Û hinek jî bibêje min perê xwe tê daye, hema ew çibe jî ezê bixwînim... Hinek jî ji bo ku pê biqehere û ji "nivîskariya" wî re xebera bide wê bixwîne... Û hinek jî wê bibêje ez zanim ev merivekî pirr derewçîne, hela ka ez mîze kim içar ci derew kiriye, loma wê bixwîne...

Ewê cardin bê gotin ku şîr û nivîsên wisa ma wê kîjan rojnama û kovar çap bike?

Li ba me Kurdîn "Ewrûpa" bira niqandin (hilbijartîn) li wîr bîmîne, ji kevir û nermtir (yanî bira Kurdi be bes) ci hebe ew çap dibe...

Hinek jî bo xatîre "xizmet û pêşdabirina" edebiyata Kurdi çap diken, "hinek jî bo nasî û xatîre xatîra, hinek ji ber fedîya rû û israrê û hinek jî ji ber "def û belayê" mecbûr dîbin çap diken...

Îcar li Swêd mesela çapê jî ne gelsek mezin e, birâ canê Kulturodet (meqamîn Swêdî) sax be; kî bêtir karibe paşgotinîyê û derewa bike kitêba wî di çapê de ye... Lî ku ew jî nebe, li Swêd pere pirr e, wê di "Eget Forlaget" a (Çapxana xwe ya şexsî) de çap bikin... Ma 12'ê llonê nehata me yê hewqas "şair", "nivîskar" û "ronakbîrê" Kurdi jî ku baniya...?

programa vê partiyê "me-selâya rojhîlat", wê di nav çerçewaya "yekîtiya Tirkîyê" de were hel kirin. Gelê me wek millet nayê qebûl kirin. Partî pişti 12'ê llonê hat girtin. Dilxwazîn vê partiyê nuha dixwazin partiyekê bi navê "Partiya Sosyalist" (SP) awabikin. Di pêşniyara programma vê partiyê da jî tiştekî nuh tuneye(\*)

## ŞAŞITIYA DİROKÎ HÎN DEWAM DIKE

Şâşitîya ku di programên partiyen legal ên çepê Tirkan de hene bê şik ne tesadufîne. Partî pişti 12'ê llanê hat girtin.

## Navdarên Kurd

**Dr. Mihemed Sidiqê Miftizade**, zaneyekî Kurd ï Kurdistana û Iranê ye, ku ji balî Kurdên Kurdistana Tirkîyê kêm tê nasin. Lê birayê wî û bi taybeti jî braziyê wî li Kurdistana Tirkîyê bi nav û deng in. Çimkî Dr. Mihemed Sidiqê Miftizade, birayê biçûk ê Mihemed Mihri û apê nivîskar û wergerê bi nav û deng Selahattin Hilav e.

Vê nivîsa han, me ji kovara Sirwe [hejmar 7, Payiza 1365'a (1986)] ku li Urmiyê (Kurdistana û Iranê) çap dibe wergirtiye. Dr. Mihemed Sidiqê Miftizade, vê nivîsarê berî mirina xwe nivîsiye û ji mamoste Hejar re şandiye. Mamoste Hejar jî di Sirwe de daye çapkiran. Em Kurmanciya wê li vir çap dikin.

**ARMANC**

Navê min Mihemed Sidiq, navê malbata min Miftizade ye. Sala 1300'e koçî yê Hetawî [hicrî-şemsî (1921'e zayıñi)], li gindê Dişe, li navça Hewramana Ciwanro hatime dinê.

Bavê min Mele Ebdulayê "Miftî" kurê Mele Mehmed, kurê Mele Mihemed, kurê Mele Ehmedê Gewre, ji malbata melayen Dişe ye.

Diya min, keça Seyid Şehabeddinê Talişî û diya wê keça Şêx Osmanê Tewêleyê Hewraman e.

Di salêن pêş Şerê Cihanê yê pêşî de, bavê min, ji bal fermanrewayen Erdelan hat davet kirin bajarê Sine û bû miderisê xwendingeha Mizgefta Dar-ul-ihsan. Piştî çend salan, di dema fermanrewatiya (hukumdarîya) Qacaran de, hat dawetkirin tehranê, leqebe "Miftiyê Kurdistanê" hat dayinê û vegeriya bajarê Sine.

Temenê (imrî) min şes sali buye, bavê min li bajarê Sine koça dawî kirîye. Diya min ji pênc sal piştî koça dawî ya bavê min, li Dişe ji vê diyayê çuye.

Min xwendina xwe ya destpêkê li gundê Dişe û Xanega û li bajarê Sine xelas kirîye.

Sala 1315'e Kaçi yê hetawî (1936'e zayıñi) min dest bi xwendina Ilmân İslâmî kirîye û min di xizmeta zanayêni dîni yê navçen Sarezûr, Merivan, Mukriyan û bajarêne Pêncwîn, Silêmani, Kerkük, Hewlêr, Rewandiz, Mehabad û Sine ders xwendîye.

Ew zanayêni ku min di xizmeta wan de ders xwendîye ev in: Kekê min Hecî Mela Xalidê Miftî, Mela Seyid Arif, Mela Salihê Terîfe, Seyid Baba Resûlê Ebadeyli li navça Şarezûr, Mela Baqirê Balk, Mele Mahmûdê Derftê li Merivan, Mele Elyê Hemamîyan, Mele Şêx Mahmûdê Burhan li Mukriyan, Mele Arifê Baneyî, Mele Seyid Eli li Pêncwîn, Mele Mistefayê Haci, Mele Resûl, Mele Ebdulayê Bêjwê li Silêmani, Mele Ezîze Şili Xaneyî li Ker-kük, Mele Salihê Dibegeyî, Mele Ebûbekir Efendi li Hewlêr, Mele Ebdulkerîm

Efendi li Rewandiz, Mele Sadiqê Sedîqî, Mele Huseynê Mecdî li Mehabad, Mele Mehmed Miftiyê kekê min li bajarê Sine ku icaza ilmî, min ji ba wî girtiye û dawiyê, li bajarê Silêmaniye Marmosten Heyeta Zanyariya Dînî û Ewqaf piştî tehqiqlikîne wê icaza min ji min re mor kîrine. Li Tehranê jî Şûra Ali ya Wezareta Ferheng (Wezareta Kultur) icazename fetwa û tedris (dersdanê) ji min re derxistine.

Sala 1923'a (1954'a) di Wezareta Ferhengî ya wê demê û Amûzîş û Perwerîsa niha (her dî ji bi mana Wezareta Kulturî yan jî hîndekari ne-n.m) bûn mamoste û min li bajarê Mehabad, Sine, Xuremabad û Tehranê ders daye.

Sala 1341'e (1962'ya) li Fakulta İlahiyat û Mearifa İslâmî ya Üniversita Tehranê min dewra lisans xwendîye û bûme doktor. Fakulta Edebiyat de ji demekê ez bi ilmî hîndekari û ziman jî bîliyam. Di wê demê de ji min di dibistanê destpêkî yê Tehranê de ders didan.

Sala 1349 (1970) ez li Fakulta Edebiyat û Ilmân İslâmî ya Üniversita Tehranê bûm mamostê zimanê Kurdi û min dersên Erebî û Farisiyi dida.


Sala 1359'a (1980) ku ji ber destpêkîna Soreea Kulturî Universita Tehran hat girtin. Firsetek ji min re deerket ku li male rûnem û nivîsina wê Rêzimana Kurdi ya ku li berre ji ez bi serihkirina Dîwana Mewlewî (Medûni) dibîlyan û niha jî her xerikê (mijûli) wî karî me.

"Çewa bû, ku ez bi ziman û edeba Kurdi bîliyam".

Di destpêka nûgîhaştina min de xerîkbûna bi xwendîna menzûmîn (şîrîn) Mewlewî û tefsîrkirina manen wan ji bal endamên malbata min û dostan, hewl da min ku peywendîyeke bi tîn bi bi ziman û edeba Kurdi redeynim. Ev peywendi bû hoyê wê yekê ku dema min li Kurdistana Iraqê dixwend, pîrtî bi ziman û edeba Kurdi bibilim. Piştî di destpêka Şerî Cihanê yê Duduya ku si-

Zaneyekî Navdarê Kurd:

## Dr. Mihemed Sidiqê Miftizade



Dr. Mihemed Sidiqê Miftizade  
hon ji nezmîn wî.

4- Durustkirin û şerh-kirina diwana Seyid Salihê Kirmanşani.

5- Durustkirina Şirîn û Ferhad, esera Mele Weled-xanê Goran.

6- Durustkirina hin ji nezmîn "Kenizek û Yazde Rezm ku beşek ejî Şanameya Kurdi, esera Serheng Elmasxanê Kenûleyi.

7- Zincire (silssile) gotarêni li ser rîzimana Kurdi, di bin navê "Çan binûsin û bixwîninewê" (Çewa binivisin û bixwînin).

8- Zincire-gotarêni li ser jîyana civaka me û rexnegirtin li ser hinek bir û bawerî û edet û qanûnen nelîrê yê civakî di bin navê "Le komelaçon bijîn" (Di civakê de em çewa bijîn).

9- Komkirin û durustkirina diwana Mela Hamide Alicanîyê ji navça Jawero.

10- Durustkirina Şereqîsey Asman û Zewî (peyv avetina berhev a Asman û Erd) nezimandina Mirza Abdulkadirê Yaweyî.

11- Durustkirina Cengnâma "Kole w Aynemel" (Kole û Aynemel) nezimandina Mirza Abdulkadirê Yaweyî.

12- Komkirin û durustkirina şûnewarêni (asarêni) Şîira gelî di şairîn Kurde, di bin navê "Le her gulzare gulê" (Jî her gulistanekê gulek).

13- Çend perçe nezmîn we latperwerî, netewayeti û evîn darî û çend kurte-çiro- kên nezm bi awayê terz û twanci netewayeti û civakî wek çiroka Mam Rêwi (Mam Rêvi) û Pepûle Silêmanê (Dîk Silêman) û çiroka Fil û Bulbul.

14- Zincire-gotarek felsefa suruştî (tebii-xweristî) di bin navê "Rêgayî Xudanasî"

(Riya Xudanasî).

15- Dirokika Hukumetên Kurd.

16- Durustkirin û çapkiranina Munacata Xanayê Qubadî, bi navê "Heft Bend".

Ev lazimî (diviyahî) hemû, li jîr uwana M.S.M. ku kurtiya Mihemed Sidiqê Miftizade ye, di hejmarêni rojnama Kurdistan de a ku bi çar beşan hatine cildkirin, li ber destin.

Rojnama Kurdistan her çiqas, di bin çavdîriya hişk a hukumetê de derdiket jî, di rastiyê de xizmetek girîng ji bo ziman, edeb û dîroka gelê Kurd kir. Lî piştî çar salan ji bo dewletê derket ku çapkiranina vê rojnamê ji bili ziyan-dana siyaseta dewletê tu fêde têde tune. Îja ji ber vê yekê di destpêka bihara 1342'a (1963) de rojname hat girtin.

Jî bili wan karêne edebî yê ku min di rojnama Kurdistan de, biser xistin, ji sala 1338'a (1959) heta Payiza 1358'a (1979) min çend zincire-gotarêni edebî, li ser edeb û dîroka Kurd nivîsin û ew di radyoya Kurdi ya Iranê de hatin belavkirin. Beşekî pirê wan gotaran di dest de ne, hinek ji wan jî di bin navê han de hatin belavkirin:

Lêkolînewey Wêjeyî (Lêkolîna Edebî), Be serhatîy Baw û Bapîran Mam (Serpêhatîyên bav û bapîren me), Wêje w Wêjewanan (Edeb û Edib) Pendî Pêşînan (Peyvîn Pêşîyan) Rastkirin û Şerhkirina Dîwana Nali, Şîrîn Awaza Stranê Kurdi yê Mestûre Erdelan ku cara pêşî min di nav muswedêni kevn de bidest xistibûn.

Girintîn karê Mamoste Doktor Miftizade şerhkirina şûren Mewlewî Tawegazî ye. Bi xwe di pêşgotinekê de ku li ser xezelén Mewlewî nivîsiye dibê: "Di destpêka nû giştîna (ciwaniya) minde, car carnan guhê min li nezmîn Mewlewî bûn, ku xîm û dostan di şevbêrîn sevan an civînên rojan de ji hendure dixwendin. Xweşîti û şerînîya van şîran, hêdi hêdi bala min kişandin, min xwest ku ez jî wek wan şîran ji ber bim û di mane û mezmûnen wan ên dilrevîn têbigihêm. Vê xweşîye, min dahf da ku roj bi pirtir li nezmîn Mewlewî bikolim, li ci ciyê ku çavê min bi destnîvesek kevn an nûh a şîran biketa, lê digeriyan ku nezmîn Mewlewî di nav wan şîran de bibînim û bi ser û pê siikandin bixwînim."

Gelek mixabin, reşebayê mirinê moletê neda ku ber û fêkiyê bexçê vî zanayê me bi temamî bidest bidest keve, wî beri temambûna vî karî giring dinya bêwefa bi cih hişt û şerhkirina Dîwana Mewlewî bi netemamî bi cih ma.

Mamoste Mihemed Sidiqê Miftizade di meha Sermawesa 1363 (1984) li bajarê Tehranê wefat kir û di Goristana Weyselquerenî ya Kirmanşan de hat sipartin axê. Em hêvîdarin, bikarbin di hejmarêni pêş yê Sirwe de hindek ji eserên vî zanayî payebilind belav bikin.

-2-

## Şêrko Bêkes:

Pirs-3 : Ta ci sînorî mesela kelepor û çiroka millî û folklorî di helbesten we de reng dane? Her weha hûn di mesela kelepür û tazekirinê de çawa dighêjin?

Bersiv-3 : Bi dîtina min pêwîste piyekî helbestvan li ser zemînê dîroka kelepürû folkloraxa xwe be û piyê din jî li ser zemînê rewşenbîriya cîhanî be. Ev her du çavkanî hevdû temam dîkin. Yek, aliyê neteweyî-niştimanî û aliyê din jî ê cîhanî bi hêz dibe. Pêwîste ku ev her du rûbar weke du avan têkîlî hev bibin. Çiroka millî û folklor, dengê resenê (eslî) wî zimanî ye ê ku helbestvan pê dinivise. Bîhn û berameya ax û pêwendiyê civakîne, buhîrka wan e, reh û rîşiyîn jîyanê ne. Bê goman, ew helbestvanê ku reh û rîşiyê wî tunebe, mîna darê di cihê xwe de hişk dibe û nikare bijî. Folklor, reh û rîşiya zimanê neteweyî ye, reh û rîşiya hest û pêhisiya civakê ye. Sîpera laşê tevgerê ye. Destan û beyt û folkloraxa Kurdî ew çavkaniyê bê binîn ku helbestvanê serdemê, bi dîtina taze a hemdem, dikare awêteya (tevlihe) hemdem a berhemên xwe bike rengekî ku di xizmeta hunerê helbesta îro û dîtuna taze ya îro de be. Nabe ku helbestvan, kelepür û folklorê bike zindan û bikêrhatin û perçebûna xwe tê de girtî bihêle. Di destan û beytên Kurdî de, di wan çîrokêni milî de helbestvanê Kurd, guh dide stran û dîlokêni dîrokî ên netewa xwe. Hebûna civakiya xwe tê de dibîne. Helbestvanê hemdem dikare gulbijêriyê bike û buhîrê li bêjîngê xe. Ji pend (gotinê pêşîyan) ên ciwan û pak û baş û li ser bingehêwan dikare karekî edebî û nûtir ava bike. Bi rengekî ku li gel dîtin, balkêş û hisa serdemê bê ava bike. Dikare ji xoşewîstiya Mem û Zînê û Ferx û Sîfî û Şîrîn û Ferhad, pîvaneke xweştiviya mezintir peyda bike... Hema (sembol) û nîşana nûtir bîne holê. Dûrbûna hunerî û civakî a wan destan û beytan berfereh bike. Min di bizavêni xwe û di vê mecalê de çend car bala xwe wan daye wan beyt û çîrokêni folklorî. Bi Bi taybetî di helbesta "Koç" û "Braymok" de û bi gelempêri di hin helbesten din de, min ew beyt li gel rûbarê helbesten taze ên xwe têvel kirin. cihê wan dêw û dehbeyen çîrokê millî îro dagirker û dijminê gelê me dagirtiye.

Braymokê evîndar bûye evîndarekî şoreşger û peşmerge û helbestvanekî mixest. Ax û dildar û Braymok û sengerê şoreşgera hemû bûne yek aso bo dîtin û têvel bûnê. Ji vê materyala xav a folklorê, helbestvanekî bikêrhatî dikare bi sedan peyker (heykel) ên taze dûrist bike. Ya girîng, çavaniya dûristkirina wane. Ji bîlî vana, "ziman"ê neteteweyî û helbestvan, zimanê resen û gihajî, çavkaniya xwe a pak, di van beyt û çîrokêni millî de dibîne. Helbestvan, nehîniya ziman di wan bênderen veşartî ên folklorî de peyda dike. Em helbestvanê ku bi hûrî agahiya lîvan aliyan neke, nikare helbesta resena hemdem binivise. Helbest xewn û xeyal û hîzirêni bê sînor e. Dûristkirina wê ji nû ve, realîtake din e. Ne emreale ku weke xwe mabe û ne jî ewe ku pê li ser hatibe danîn. Hat û cûna di nava wan her du cîhanan de xeyal û afirandînen helbestvan taze dîkin. Serekaniya kelepür û folkloraxa me Kurdan dewlemend û bi ber e. Piraniya van beyt û destanan jî heta niha weke befra sipî nin a ku nehatiye detdan. Helbestvanê huner-mend, dikarewana bike hêvînê (heyvanê) gelek helbesten hemdem. Û ji wana, bo xeyal û lînerînê xwe tazetir wergir e.

Pirs-4 : Hûn di derbarê helbesta berxwedanê de ci dibêjin?

Bersiv-4 : Helbesta berxwedana Kurdî, di sengera êrîskirina zulm û zora dagirkeran de şerê zimanê huner û afirandinê ye. Çekekî din ê xebata netewa me ye. Çekeke ku mil bi milê çekê pêşmerge ve ye û li gora her qonaxa dîrokî di cengê de ye! Ji wê roja ku zimanê edebî û niviskî ketiye ser kaxezê û ji wê roja ku Kurdan bi çewsan û zulm û zora netewî his kiriye, bi pîvana şiyariya politîkt-civakî a her qonaxê re helbest jî, kêm û zêde, xav û tûj, bi gurî û nîzmî di meydanê de bû. Çunkû helbest, zimanê his û pêhîsîna helbestvan û dîl û nava civatêni xelkê bû.

Helbest, ji kevintirin afirandinê qada edeba me ya Kurdî ye. Reh û rîşiyen wê kûr in. Ehmedê Xanî, destana Mem û Zînê ji ber zimanê Kurdî nîvisiye. Ji bo ku nebêjin Kurd ne xwediyê ziman û çarenusa xwe ne. Ev, hizirkirineke berxwedanî ye. Ji hebûn û man û berdewam-bûna netewî re berevanîkirine ku ew jî serrast bi zimanê netewî ve girêdayî ye. Helbet, li gel bilindibûna hest (his)a civakî-neteweyî, li gel tûjbûna xebata politîkt-û serhîdan û raperîn û şoreşen neteweyî, li gel çîrbûnan pêwendiyen

# "Helbesta berxwedanê de dengê xwîna şehîdan û de

Eylûlê rabû, weke çawa xerîteya politîkt-civakî ya Kurdî kete guhertinê, xerîteya politîkt-civakî ya Kurdî kete guhertinê, xerîteya helbesta berxwedanê ji hate guhertin. Ji aliyê zulm û zor û çewisan-dinê, helbesta berxwedanê, bilintirin helbesta pêhîsîna mirovê Kurd e. Neynika bajar û gundê xwînavî ye. Di dema niha û di Kurdistana Iraqê de, di dema ku şoreşa nû ya Kurdî li hember faşizmê rabûye, berevaniyê ji hebûna mîletekî dike, dara azadiya me rojane bi xwîna şehîdan tê avdan. Ji aliyê kolonyalisten dagirker ve politika sotina erdê Kurdistanê tê ajotin, bi sedan lawên têkoşer têne bi darvekirin. Bi hezaran Kurd, ji cihê hezar saliyen wan têne qetandin, têne mişextkirin. Di demek weha de em bi dehan destanê azayeti (ger-nasî) û qehremaniyê tomardîkin. Helbet di dema niha de helbesta berxwedana Kurdî ji temam geş bûye. Bûye beşek ji sengerê berxwedanê. Bûye pêxwarin û zadê rojaniya şoreşeran..bûye sirûd (marş) û strana nav sengeran.

rêzkirî ne be, naverûka tiştan bixwîne ne ku ruwêwan. Bi kûrî biçe nav cergê bûyer û nexweşîyan.. Tabloya hest û pêhîsîna helbestvan û xelkê ya rastgo be. Helbesta berxwedanê, helbesta çarenusa civakî ye.. Goranî û strana dil û navê ye. Helbesta berxwedanê dengê axê ye.. dengê xwîna şehîdan û dengê dîrokê ye...

Pirs-5 : Wek helbestvan û rewşenbirekî Kurd hûn, di vê qonaxê de, xebata şoreşgerî ya Kurd çawa dibînin? Û bi dîtina we gelo rewşenbirekî Kurd di vê qonaxê de erkê (wezîfe) xwe yê niştimanî bi cî anîne?

Bersiv-5 : Bi baweriya min niha hebûna gelê Kurd, di ber devê mezintirin tirsa ji holê rabûn û qirkirê de ye. Axeke dabeşkirî û perçekirî, neteweyekî di we-latê xw de mişext û di mala xwe de xerib.. Çarenusa îro ev e: Man û neman! Ez bi vê lînerîn li xebata şoreşgerî ya gelê Kurd dinêrim. Bervanîkirin ji hebûn, man û nemanê dikeve pêşîya hemû durişmeyen din. Xebatkirina li diji kolonyalîstên dagirker li Kurdistanê hemû, dikeve pêşîya hemû xebatên din. Pêwîsta ev xebat jî, li çendî meydanêni cihê cihê bête bicikirin û ji hev neyê cihêkirin. Xebata çekdarî, polîtîktî, çandî, edebî û hunerî; ev hemû weke zincirê bi hev ve girêdayî ne. Divê armanca hemû tekosher û xebatkaran li seranserî Kurdistanê; Kurdistanêneke azad, sebixe û yekgirtî be. Û tu alternatifke din ciyê vê aramancê nagire. Helbat bicîanîna vê yekê ji beri hemû tiştî bi xebata şerê man û nemanê dibe. Eva naveroka mesela Kurd e. Eger têkoşerên Kurd yekgirtî nebin, eger diwarekî li hember dagirkeran çeneke, eger nebîne yek şûr û yek dest û yek çek û yek bîr û bawera hembeş, tu caran armanca Kurdan a mezin nayê cî. Ji mêj ve me gotiye, bila em ji nakoyîn navbera dagirkeran qezencê bigrin. Lî mixabin heta niha her tim dagirkeran ji nakoyîn têkoşerên Kurd qezencê girtine! Pêwîstiya me bi hêza pêşmerge û a pênuş û hêza yekbûyî a manewî heye. Çarenusa duweroja Kurd, bi vê rastiya hîsan ve girêdayî ye. Di realîta îro a Kurdistanê de, rastiya tal û dijwar a perçabûnê de, nakokî û netebayî û pirhebûna partî û grûbêni bê hejmar û ji hev dûr û li dijî hev ku her yekî mîrnîşînek (eyalet) partiyeti bo xwe xêz kiriye; ev reala tal cihê dax (hesret) û kesera me




Foto: Armanc

çînatî û şoreşgerî helbesta Kurdî ji diguhertinê de bû. Çiqas ku şiyarbûna niştimanî a mirovê Kurd bilintir dibû, çiqas jana axa Kurdistanê mezintir dibû, ji serpêhatiyê taze yên ji dayikbûnê, helbesta Kurdî a berxwedanê ji purtir û temamtir dibû. ger em bi lînerîneke dîrokî li edeba Kurdî binêrin; em dibînin ku di wan qonaxanan de helbesta Kurdî a berxwedanê geşter û diyartir e. Di qada xebat û berxwedana realî a xwe de, tekoşin jî geşter û dijwartir bû. Helbesta berxwedanê weke çawa ku rê ronî dike, rê ji wilo jê re tê ronîkirin. Di dema raperîn û şoreşen Kurdistanê Tirkî, Çran û Iraqê de...li gora her qonaxeke wan xebatan..helbest jî, mil bi milê wan xebatan, li gora bilindî û nîzmiya van raperîn û şoreşen di geşbûnê de bû. Di serdema Hecî Qadirê Koyî û pişt re di serdema Bêkes de helbest di kelînê de bû...ji ber ku giyanê berxwedana şoreşgerî dikeliya. Helbestê, rola rîberiyê kiriye. Helbet, helbesta Kurdî a berxwedanê, li Kurdistanê Iraqê, ji wê demê ve bi pêltir hate holê. Dema ku şoreşa çekdar a

şoreşçêkirin, ne tenê çek e û ne jî tenê teqekirin e. Şoreş çek e û helbest û program e û stran e û huner e û zanist e, hemû pêkve ne. Geşbûna helbesta berxwedanê, ji geşbûna xebata gel e. Vemirîn û bêdengiya wê jî ji vemirîn û bêdengiya serdemê ye.

Hunermend, ji wênekeşana gundekî sotî, ji kuştina kevokekê, ji birrîna darekê, ji hêsira zarokekî Kurd ê mişext û ji nameya destgirtiya tekoşerekî dikare berhemên rengîn ên berxwedanê durist bike. Em helbestvan û nîvîskarê Kurdistanê Iraqê yên niha, materyalîn afirandinê xwe ji realîta rojane werdigirin. Çavkaniyê helbest û edebiyata berxwedana me, ji ser cadde û nava bazarên bajaran ta bi gund û nav cotkar û bin-gehêneşmergeyan in. Bê goman dema ku ez bahsa helbesta berxwedanê dikim, mebesta (qesta min) min eve ku tu caran aliyê wê yê hunerî di nava awayê xwendinê de wenda nemîne..durişmîn politîktî ne tazî û tissî bin. Lî dawiya dawi, pêwîste ku helbest be. Helbest be û paldêr jî be. Gotina asayî (normal) û

## Rêga

Rojê zemîn bûrkanî bû  
Burkanî Kurdistanî bû  
Kurdistanî kurrî wekû  
"Ararat"î lêkewtuwe  
Araratîş Kurdî lê bû  
Kurdîş duwaney cewsanewe  
û têkoşînî  
Be yek sik bû  
Lew duwaneyes  
Rêgay wekû  
-Yılmaz Guney- le dayik bû.

# HEVPEYIVİN HEVPEY

gê axê ye...  
ngê dîrokê ye."

Hevpeyivin : Bavê Stêrê

hemûyan e. Dî vê cûdabûna berbelav de em dibînîn ku pîrrî caran di nava çendin parti û gruban de, niqteyên hevgirtinê, ji ên dûrketinê û nakokiyêne ïdeoloji bêtirin. Lî bi zanebûn dirêjîye didin nakokî û netebayîye -bi taybetî li Kurdistana Tirkî. Bi dîtina min heta ku em di vê qelebalixa ïdeoloji û bêser û ber de bijîn, em nikarin dijminen xwe yên mezîn bavêjin erdê. Serketin yekgirtin e. Di dema ku azadîxwaz serê hev dibirin, em nikarin behsa duweroja ronak û azadiya gelê Kurd bikin. Di demeke wilo de ku ev nakokiyê bi vî rengê trajedî di nava r3ewşenbîr û kargêrên Kurd de ewqas kûrbûye, diyare erkân niştimanî û şoreşgerî, bi başî û politîkî a dijwar di nav a rewşenbîran de jî reng dide. Ta ku em dawiya şerê nav xwe neynin, em nikarin di tu derecê de û weke tê xwestin li hember dijmin û dagirkiran li ber xwe bidin. Ger em bi çavên dijmin li vê realîte binêrin, emê bizanibin bîhêzbîn û bêhêziya me çiqas e. Serpêhatiyêne me li Kurdistana Iraçê ya dagirkirî, di vî warî de pirrin û dewlemdin. Ji bo dost û dijminan jî hate xwiyakirin ku mezintirin serketina şoreşgerên Kurden Kurdistana Iraçê, ew lihevhatinê politîkî bûn ku di nava hêzîn Kurdistanê de çêbûnîn -YNK, PDK, PSK, PASOK-. Bi baweriya min eger ku hevpeyman û hevkarî pêşdeitr biçin û hêzîn pêşmerge û weşan û dezgehêne din ên şoreşa Kurdi yên bikêrhatî bibine yek emê seketineke mezîn bidestxin. Pêwiste yek şoreşa me hebe, yek hêz û yek weşan hebe. Bi kurtî erkê rewşenbîrên Kurd, di vê qonaxê de beriya hemûtiştî bi yekgirtina xwe a strateji ve girêdayî ye. Çiqas ew yekgirtin bîhêztir be, erkê niştimanî û netewî baştıri bi cî tê. Pêwiste li seraserî Kurdistanê ev yekgirtin çêbibe. Bicîanîna vê erkê, ji rewşenbîrekî ta yê din cihê ye. Mebesta me di vir de rewşenbîrên şoreşger in, ew ronakbîrên çarenûsd xwe bi ya gelê xwe ve girêdanin. Em nivîskar û edîbêne Kurdistanê me di navçeyên Kurdistana Iraçê yên rizgarkirî de nêzîkî sengerên pêşmerge karîbû hinek ji van erkan bi cî bînin. Di van du salêن borî de me bi dehan berhemêne edebî, dîrokî û rewşenbîrî çap kirin. Kovara xwe ya mehane ku piraniya wê bo edeba berxwedanê tête terxan (texsîs) kirin, em diweşînin. Kovara "Nûserî Kurdistan" û "Gizing", pêxwarina rewşenbîrî û pêşmerge û hêzîn şoreşgerên Kurdistanê nin. Helbest û çirok û romanêne me di tûrîkî her pêşmergeyekî de hene. Ta ku bi nehînî jî diçine nav bajaran, di nava destan de digerin. Mixabin em, ji bizava ronakbîrî ya parçênen din ên Kurdistanê baş ne agahdarin. Diyare ev jî bi hoyêne objektîv ve girêdayî ye, ku em jî axa xwe bê xwendî kirine. Ev jî kesereke kûr e.

Pirs-6 : Astengen li berdevê cihana rewşenbîrî û edeba Kurdi ci nin? Û dîtina we li ser zimanê edebî yê yekgirti yê Kurdi ci ye?

Bersiv-6 : Heta gelê Kurd, li Kurdistaneke yekgirti, serbest û azad ne jî, hertim ewê di riya edebî û rewşenbîriye de asteng tije bin. Yek ji problemen mezîn ên ziman û edeba Kurdi, nebûna

zimanekî edebî yê yekgirti ye. Xwiyaye pêwendîya wê jî bi vê realîta nelihevhatî ya mesela Kurdi ve heye. Ev çend şêweyên cawaz ên nivîsandîn bi zimanê Kurdi, sedema rewşa rewşenbîrî ya ne cîgir û parçebûna edeb û rewşenbîriya me ye. Bi baweruya min, zimanê ku bibe zimanê edebî yekgirti li seraserê Kurdistana mezîn; tenê bi desthilateke (hukum) politîk durist dibe. Dibe ku rola kom û komel û rîexistinê rewşenbîrî û edebî di geşkirina zimanê yekgirti de hebe. Lî bicîbûna vî zimanê yekgirti; ku xwendevanekî Silêmaniyê û Mehabad û Dêrsimê weke hev tê bîhîjin û bixwînin û pê binivîsin, bi çarenûsa duweroja gelê Kurd ve girêdayî ye.. Bi desthelata politîkî ve, bi serxwebûn û yekgirtina Kurdistanê ve. Ziman, hestiyê pişta millet e. Niha, movikê vî hestiyê pişta me ji hev sist in. Aha ev sedeme ne helbestvan û edîbekî naskirî yê Kurdistana Tirkî li cem me tê naskirin û ne yê me li cem wan tê naskirin. Divê, weke du rîewiyêner xerîb xwe bi hev bidin nasîn. Ji bo vê perçebûnê pîrrê caran em di hev nagîhîjin. Komelên rewşenbîrî üedebî û rojname, dikarin çendin pîren hevgirtinê di nava me de girêbidin. Lî dîsa ev jî çareseriya bingehî nake. Edîb û rewşenbîrî û ronakbîrên Kurd, ta azadiya temam nebe, nikare weke tê xwestin bilîlivî. Ji bo edîb û hunermend serbestî, weke ba û bîhîkêşanê ye. Astenga li pêşîya edîbê Kurd asteng nebûna azadiya gelê Kurd û bindestiya wî ye. Bi rakirina vê astenga mezzin tenê, meselîn din jî bi temamî têne çareseriya, ku mesela zimanê edebî yê yekgirti

yê Kurdi, yek ji wan meslîn mezîn e.

Niha, bizava edebî li Kurdistana Iraçê gavên mezîn pêşde davêje. Helbest, pêşketîtirin aliye edebê û temamtirin bes e. Helbesta Kurdi ya hemdem, ji aliye başiyê ve hîc ji helbesten pirşengdarên cîhanê ne kêmter in. Kurteçîrok di geşbûnê de ye. Hunerê roman nivîsinê li serê rîye. Bizava şanonyme û şanogeriyê ji panzde salên borî ve qonaxeke girîng derbas kiriye. Helbet, pêwendîya objektîv a rewşa politîkî ya Kurdistanê bi vê geşbûn û pêşketinê re heye. Her ci gava serbestiyekê awete jî çêbûbaya, ji edeb û rewşenbîriya Kurdi re, keysa geşbûnê zêdetir dibû. Ü bi gavên xweş û zû pêşde dicû.

Helbesta nû ya Kurdi, dema ku meriv bi Kurdistana Iraçê re hember hev bike, li Kurdistana Tirkî û ya Îranê paşdetirmaye. Li Kurdistana Iraçê geştir û pêşketîtir. Xwiyaye ev jî bi hin hoyêne objektîv ve girêdayî ye. Min hinek ji wan helbestan xwendine ku bi zaraveyê Kurmanciya bakur, di hinek kovar û rojname de hatine çapkirin. Piraniya wan helbestan hesan in û dereca huneriya wan nizm e. Bêtir nêzîkî gotinê asayî ne û di qalibê huneri de nemane ne.

Pirs-7 : Heta niha berhemêne te yên çapkirî û ne çapkirî ci nin?

Bersiv-7 : Berhemêne min ên çapkirî ev in:

- 1- Trîfey Helbest (Helbest)-1968,
- 2- Kejawey Gîryan (Helbest)-1969,
- 3- Kawey Asinger (Şanonyme helbest)-1971,



Kulûba PEN a Swêdê xelata "Kurt Tuholsky" di sala 1987î de da şairê Kurt Şérko Békes di sûret de Ş. Békes bi serok vezirê Swêd Ingvar Carsson (yê ortê) û xwediya xelata par, Don Mattera (ji Afrika Başûr) re.

4- Min Têniwetim Be Gir Eşkê (Helbest)-1973,

5- Ask (Şanonyme helbest)-1976,

6- Kaziwe (Kurtehelbest)-1978,

7- Dû Sirûd-i Kêwî (Helbesta dirêj)-1979,

8- Pîremêrd û Zerya (Wergeran-Romana E. Hemingway)-1981,

9- Rûbar (Çirokehelbest)-1984,

10- Helo/Keşkolî Pêşmerge-sê bes (helbesta Berxwedanê)-1985,

11-Awêne Biçikolekan (Helbest), 1986,

12-Dal-1987

Ev du berhemêne dawî di jiyana pêşmergetî, li navçeyên Kurdistanê yên azadkirî hatine nivîsandin û weşandin û belavkirin. Ev berheman, ji bilî dehan gotarêne edebî û pexşanehelbest (nesîr) û rexneyên edebî û werge randina çendin şanonymeyan in. Niha jî di komên helbesten min ji bo çapê amade ne. Beşê pirr ê van helbestan ên salêن cihê ne. Hêviya min heye ku di rojeke nêzîk de ez vana çap bikim.

**Wilat**  
Wilat zore le Kurdistan  
şox û şengtir  
xwêner germtir.

Wilat zore le Kurdistan  
çawî geştir  
Esk súktir.

Wilat zore le Kurdistan  
Qise xoştir  
Des rengîntir  
Belam ey Kurdistanekem !  
Wilat niye hergîz le to  
xoşewîsttir !

Pirs-8 : Şîretên te ji bo helbestvanen xort ên Kurd ci ne? Ci gotinê we ji bo xwendevanen "Armanc"ê hene?

Bersiv-8 : Şîretkirinê helbestvanen kareshî e. Yan jî bi awakî din, dibe ku neyê qebûlkirin (pesindkirin). Ji ber ku her helbestvanekî, awayek û lênerînek û rîbazeke huneri ya wî taybet heye. Ez şîreta nakim. Belam bi serpêhatiyêne xwe, bi serpêhatiya dema herzekariya (ergînlik) helbesten xwe, ez baş tê gîhîjîme ku gelek caran lezkirina min, kêm xwendin û pirr nivîsandina min ziyanike mezîn gîhandîye min. Destê min bi vî agirî lezkirinê kiziriye. Helbestgotin ne her ji bo helbestgotinê ye, jiyan jî ne bîtenê helbest e. Ü bikêrhatin jî ne mercin ku di hergavê de serketî be. A gîhîng ewe ku helbestvan bizanibe çawa rastgo binivîse û dikare ci biservekirinê bike. Ger helbestvan, dubarekirina dengê helbestvanekî din be, ger bixwe reng û rewş û dengê taybetî ji bo xwe durist neke, bi ya min helbestvan nenivîse baştir e. Xwendina pirr û çîr û mist, sermiyana mezîn a bikêrhatinê ye. Bikêrhatin çend pirşengdar jî be, ger bi serpêhatiyê jiyanê û rewşenbîrî neyê dewlemendkirin, ji cîhê xwe pûc dibe. Bila em binivîsin, bipirsin û netirsin.

Diyare piraniya xwendevannê rojnama "Armanc", ew Kurden mişext in ku niha li Ewrûpa û welatên dervî Kurdistanê dijîn û kar dikin. Ü diyare "Armanc" dijîhîje Kurdistanê jî û pêwendîyêne xwe bi hundir ve qayim kiriye. Ez ji bo beşê yekem ê Kurden dervî Kurdistanê dixwazim pêwendîya xwe bi zimanê Kurdi re berdewam bikin.. Ci bi zaraveyê Kurmanciya bakur an a başûr be, xurtir bikin. Hewl bidin ku rûpelîn "Armanc"ê bi hizirê xwe dewlemendir û xweşiktir bikin. Hewl bidin, bizav bikin, di mecalâ karê xwe de mesela dadimend (meşru) a Kurd, bi biyaniyan bidin naskirin. Pêwiste, giyan û alîkariya xwe ji civatêne xelkê Kurdistanê nepiçînin. her yek ji aliye xwe ve hewl bide ji bo civandina saman (serwet) folklorî û bermayeyê netewa me. Ji bo ku wenda nebin. Li dijî sînorê destkar (sunî) ê dagirker û emperyalîzmê rabin. Hizira Kurdistanê bi hêz bikin, yarmetiya maddî û manewî ya pêşmergeyên Kurdistanê bikin.

Hêvi dikim di duwerojê de ez û xwendevanen "Armanc"ê çend carêne din li ser rûpelê û rojnama xoşewîst bigihin hev.

Diyariya min a vê carê, ji bo "Armanc" û xwendevanen wê "çend kurtehelbestin" ku li demen cihê cihê hatine nivîsandin. Ji xwe bi kurtî be bi dirêjî be helbesten xwe tê nasîn û ew dibin organê dil û nav û hest û pêhisîna wî...

Di tercuma vê hevpeyivîne de li gel B. Stêrê heval DILDAR jî alîkariyek gelek mezîn bi me re kir. Ji bo vê alîkariyê em gelek sipas dîkin.

## ÇİROK

## Berî heyv hilê

-2-

Dema çav bi xezalê û mindalê wî ket Xecê û zarokêni wî hatin bîra wî ku Şerînê digot: "Bavo tê kengî disa werî". Xwest ji bîr bike... Silav da, bi dengek qelebalixî silav lê vegerandin.

Seyitxan, Qasim û Ahmet li quncekî li ser kêlekê pal dabûn cixare dikışandin û li ser derbasbjûne bi hev dişewirin. Seyitxan destê xwe jê re bilind kir wek ku bêje "Va em li virin" Ber bi wan de çû. Ci jê re vekirin ew jî rûnişt. Her çara jî hevdû baş nas dikirin. Wek sondxwarya bi hev bawer bûn.

Partiyê ji bo birin û anîna misfrêzan di sînor de wazîfe da bû serwan, jîber ku herêmê baş zanî bûn. Wan jî vê wazifê bi dil û can û bi bawerikî mezin bi ci danîn.

Abûzêr, pênc şes hevala li dora xwe civandibû û dest bi heneka kiri bû. Qala serbûriyên xwe yên girtigehê dikir. Di got: Rojekê polisan yekî girtibûn bi işkence û lêdanê belkî kuştina bîst kesi xistibûn situyê wî. Lî disa jî dev jê ber ne didan. Di gotin de bêje ji vana pê ve te kî kuştîye mîrik di nav xwin û xîrariê de devû çav lê werimî bûn di got.

- Welehi hew evin. Ji dervîvana min tu kesî ne kuştîye. Komsîr, emir da dora xwe got:

- Disa elektirîkê bidin canê wî! Rebeno desten xwe bilind kir û got:

- Rawestin, rawestin, dudo mane ezê wan jî bêjîm. Serokwezirê kevan yê İtalya Aldo Moro min kuştîye û Fermandarê NATO yê bi dare bestê li Romayê min Revand. Tîqîn bi cemêta dora wî keti bû, heneka ji kena bi zikê xwe girti bûnû xwe li ser piştê vezelandi bûn. Edetê Abûzêr bû, hema ku wextek vala bidita dest bi pêkenîş û laqirdî ya dikir. Emrê wî hinê ne bibûhîh, lê wexta mertî lê dinêri, te di got qey cil salî ye. Yekî pişt xûz û bê can bû. Bi serê zimana dipeyivî, çavêni wî wek du cîncoqa li ber ronayîya finda dibirîqî. Ev cara çara bû dîçû milê din û dihat. Cara bûrî di sînor de ser derketi bû, mîrxiyâ xwe di wî şerî de dabû nişan dan. Çavêni xwe ji şerî ne dikuta

Azad û her sê hevalan şêwra xwe qedandibûn, bîryara bi rîketine da bûn.

Beri ku deren Azad xwest li ser gelşen bi rî de dibe kuli wan bi qewimin hevala agahdar bike.

Rabû ser xwe, qûna kleşînkofê da erdê bi her du destâ lûla wê girt û ber bi pêşiyê de xwe bi ser de sipart. Bi dengek ku her kes bibihîze got: "Geli hevalan" Bi gotina wî re deng ji hemûyan bîliya. Her kesî dev ji mijulatîyan berda bûn godarıya wî dikirin. Lewra zanî bûn Azad di vî sînorî de mirovek bi kérhatî ye. Bi salaye di vê rîyê de bi fedakarîkî mezin dixebeitê û hemû şert û srûten vî sînorî dizane. Jî ber vê yekî pêwîst bû her gotina ji devê wî derê di serê xwe de bi ci bikin jû li gor wî bimeşin. Van gotinan bi qandij jîyana wan gîring bûn.

- Her weki ku hûn jî dizanîn, di vî tîxûbê de roj na buhure ku lawek Kurdistan ji alîyê cendirmen cûnta faşist de neyê kuştin. Her bi pêhe-

sana çû yîn û hatina şoreşgeran re zêde tir har dibun û leşker dadigrin herêmê. Her serê du kilomeetrayan qereqolek danîne. Ber êvarê bi tarî dakteina erdê re di serê her sed metreyî de cote cot leşkeran di kozikêni tixû de bicidikin. Panzêr û tirinbelê leşkerî heta serç sîbî dîçin û têr. Der û dorê tixûp bi projektoran kîvş dîkin. Jî ber vê yekî divê em li xwe pir miqate bin. Heta ji me bê divê em nehêlin ser derê. Ku şer çebibe xisar ji me tîfede ji dijmin re be. Çimkî di roja iroyin de ji me xurtir e. Bi spê re wê disa bavê ser gundan tade, zîlm û zorê li wan bikin û sedan kesa bigrin û bavê zîndanan. Li ser vê xizantiyê wê disa xwêkîyê bi zor ji wan bistînîn û namûs ê eyalê gel birçî û tazî li ber diwaran bîhêlin.

Lê dema ku qewimî divê em tu tişti ne fikirin. Bi kuştina pêncî leşkerî be jî em naxwazin hevaleki me birin bibe. Lî dibe ku em tew jî bêm kuştin. Ne tu mineta me li dijmin û ne jî ya dijmin li me heye. Ku ji destê wan bê de me qir bûkîn u ku ji adeste me jî be emê koka wan derxînîn. Lewra ev şerê çinayeti û doza welatekiye.

Bêhna xwe ji kûr ve kîşand û domand.

- Rewşa çûyîna me jî dê wilô be. Hevalê Xelil li pêşîya misfrêzê û hemû hevalen din li pê hev bi qorek dê li dû wî bimeşin. Dema Xelil bîbêje li ser çeka an li qilefiska an jî li şipîya bi meşin an rawestin pêwîste hemû heval bi gotina wî bûkîn.

Divê bi dengê bilind tu kes bi hev re ne peyive. Wexta Xelil bi xwaze hevala li ser tişteki agahdar bike dê bi dîzîjî hevalê xwe re bîbêje, ew jîjî û dû xwere û dinji û din re... Bîvîhawî heta hevalê dawîyê haydar dibe.

Dema şer derê pêwîste tu kes pas de venegerin. Eger ku birîndar bîbin jî divê xwe bavê milê din. Ji ber ku pas de veger ji sedî not û neh kuştin e. Nexasim ji hevalen ku herêmê nasnakin re. A duduva divê her kes li hevalê pêşî û dawîya xwe godar be, kîjan heval birîndaran xirab bikeve dive bêkelaskirin çimkî di vî tîxûbê de ki bi desten cendîman keve yan gulebaran dikin dikujin yan jî li ber çavêni gundiyan ji bo ku bîbe sosret nemayîyê dînyayê pê dikin.

Bîdestê rastê kleşînkofê ji erdê rakir avêt milê xwe û got:

- De rîya me vekirî be.

Wexta axaftina xwe qedand libat disa bi şikeftê ket. Haziriyen xwe yên dawîn dikirin.

Xezalê jî kurê xwe danî bû ser piştâ bavê wî Mûso û bi şemleke dirêj ew baş dişîdand. Zarok serê wî li ser piştâ bavê wî xwar bûbû û jî xwe de çû bû. Ji bo ku di sînor de negîrî û dijmin bi wan nehese, derman dabûnê û bê hiş kiribûn.

Berê Azad, Seydxan, Qasim û Ahmed, paşê Xelil li serî wek xelekên zincirê li pê hev hemû bi deşte de meşyan.

Şev ker bûbû. Tarî û zulumat bû. Di vê şeva havînê de jî wek her şevêni esman çik sayî bû. Sîterka leyelan didan û dibirîqîn. Lî şewqa wan hew li dora wan dima, tu fêda wan nedîghişt tariya li rûyê dinê.

## H. Holî

## Sermiyanê gel

Elikan Berçem

Tiştê Her Şerîn Jî Ziman e,  
Tiştê Her Tal Jî Ziman e.

Dibêjin rojekê civata mîrekî Kurda yê navçeya Botan geriya bû. Oda wî heya dev ji axa û began, ji dengbêjan û tembbûrvana, ji ilimdaran û gelek kurebavê din tije bû.

Vî mîrê Kurda ji civatê pîrsî bû: "Gelo kî dikare bîbêje, ku tiştê di dînyayê de herî şerîn û herî tal ci ye?" Mîvanan li hev riheñtin, Bûbû pise-pisa wan. Ew bi hev û du dişêwirin û ji xwe re digotin: "Gelo mîr dixwaze çi bîbêje?"

Her mîvanekî tiştek got. Lî tu kesî ew bersîva ku mîr dixwest neda. Bermaliyekî ji yên Mîr, yê ku çay û qahwe li ber mîvanan digerand, ji ber derçika devê derfî rabû ser xwe û got: "Mîrê min, ku kerembikî, ez dixwazim pîrsa te bîbersivînim." Piştî ku Mîr misade dayê, bermâli bersivand: "Mîrê min, di dînyayê de tiştê herî şerîn û herî tal jî ziman e. Lewma jî pêşîya ne beradayî gotiye: 'Mîrov dikare bi xebera xweş dînyayek nûjen ava bike û bi xeberek tal jî dilê dînyayekî ji xwe bîhêle."

Wekî di vê aqilmendiya bav û kalan de jî tê dîtin, gelê Kurd timî hij (hez) ji zimanê xwe kiriye û bala xwe daye wî. Heya jê hatiye ew bi pêş ve bîriye. Xwestiye wî şerîntir bike û wî weki bûkê bixemilîne, ji bo ku karibe marê kor ji qule derfîne.

Gava mîrov li dîroka zaniyariya retorik (delalpeyvîn, ilmî ji bo delal peyvandinê) dinêre, hîngê mîrov dibîne, ku ciyê retorîka Mezopotamya ne piçûk e. Heya iro jî hîn qewal, koçek, pêşînam, feqîr û şêxen oldarî (olî) dîkin.

Divê ku ew qewlan bi dengbêjî û dûan jî û bi nîvdengbêjî ji pêk bînin. Ji bo vê yekê texnîka peyvandîne ciyekî girîng distîne. Ev tiştekî zelale, ku bixwazin nexwazin divê ku ew li ser texnîka delalpeyvandinê mijûl bîvin. Ev qewl û beytîn oldariye bi devkî têne gotin. hînek jî di bere li tembûrê, li defê û li ribabê dîxin.

Li ser texnîka delalpeyvandinê xelk jîberxwe ve jî xebitiye. Ji bo bêja baştîr û zelaltîr bîbêjin, xelkê rîzân zûgotinê afirandine. Ji bona ku zimanê wan lihevnearqile, van rîzân liserhev bîbêjin. Ziman bi vî awayî bi pêş ve diçê. Mîrov hînî kultura peyvandinê dîbe.

Em dikarin bîbêjin, ku ev parek ji retorîka Kurdi ya gelêriye. İro mîrov kare van rîzân zûgotinê di retorîka zanyar ya modern de pêkbîne.

Çend heb ji van zûgotinê Kurdi yên gelêriye ev in:

1. Heft baq derzî, derzî bi derzî, qula (kuna) derziya diya min re dibezi.
2. Sê selik di ava ro de têr, yek tû, yek mû, yek gû, bi dev çûme tû, bi linga çûme gû, bi destâ çûme mû.
3. Kevokek hate ser dîwarê me, min tiliya xwe da pinda wê, wê pinda xwe da tiliya min.
4. Mişk û qermûş li tîfîkê, min qermûş xwar, mişk ma li tîfîkê.
5. Bûkê li wê kin, bûkê li wê kin, heya bêm bigêhêmê.
6. Dar û werfî li çiyayê helkiz.
7. Gayê gezo li gûgolika dibezo.
8. Kerê reş li rîzde ziriya.
9. Tirr û tirp di cî de, min tirp xwar, tirr ma di cî de,
10. Kurn qupm qul kir.

Kelkê rîzân zûgotinê wisan afirandune, ku meriv mecbûre rast bîbêje. Gava ku yek wan çewt bîbêje, hîngê ew xwe bi xwe ceza dike.

mezin ji me re derxîne. Fikra Azad her sêyan ji qebûl kir. Qasim û Ahmed li milikî Azad û Seydxan jî li milikî gule dan ber devê tîvingan û hîdî hîdî bi dizî ber bi reşiyê de meşyan.

Dijmin bi tidarek û tevdîr bû. Bi şopa çûyîna di wirde hesiya bû. Kozikek nû avêtibûn navberê û herdem godariya wan li ser bû. Hêz amade kiribûn bi teqînê re dê bîçûna alîkariya kozikan.

Dûmahîk di hejmara bê de

helbest helbest helbest helbest helbest helb

## Mueyid Teyib

## STRAN, BEFR Û AGIR

Ne ezeni!  
Neke Keni  
Welatê min..befre, befre û  
Kengi beşir bûye tenî

Ne ezeni  
Neke keni  
Welatê min ne rûbar e  
Li nav deryayê winda bit  
Welatê min ne buhar e  
Havîn dê hêt û çirmisit  
Ne, welatê min çiya ye  
Çiya j'cîhê xwe na lîvit  
Befra me jî her a keti û  
her dê kevit

Welatê min hey befr û xwîn  
Tu ne baxî..  
Da ez bêjim!  
Ew baxê garan tê çerîn(1)  
Min ne vêtin  
Tu ne Le'lîxanî û ez Hesemaxa(2) me  
Da ez bêjim!  
Ew singê hatye perixîn(3)  
Min jê ne vêt maç û evîn  
Ne, tu behrî û  
Behr b'devê sa pîs nabît  
Dil ji eşqa te rîs(4) nabît

Welatê min hey befr û xwîn  
Demê şev û tarî d'revin  
Rojê hêdî tirojkêt xwe belav d'kirin  
Min çavêt xwe jêkve d'kirin  
Da sehkeme..  
Çiya, dol û nehalêt(5) te  
Min digotî:  
Hawar tu çendê mezînî  
Tu behrekî û ya bê binî  
Lê rojekê birînek d'singê min çebû  
Derê birînê her vebû  
Heta ku bûye pencerek  
Min tê re dit..  
Te bi çend çiya û dolêt xwe ve  
Dilê min yê kiriye hêlin  
Hingê min zanî singê min..  
J'çiya pirre  
Tu yê biçûkî û dilê min  
mezintir e.

Welatê min xwîn û kevi(6)  
Kê gotiye tu yê keti yan dê kevi  
Ger tu ketbay  
Çewa gemî da b'rûbara da hêne xar?  
Çewa roja me da helêt û ava bit  
Bite spêde..  
bite nîvro..  
bite êvar?  
Çewa şivan da bilûrêt xwe helgirin  
Çewa şerêt te da xurîn?(7)  
Çewa perasi(8) da dilê min vegirin?!

Welatê min  
Çend du çavêt reş û belek d'kevne serêk  
Du nergizet şeng û şepal d'kevne berêk  
Û hosa dê rojek hêtin  
Dê biye mergeka xemlin  
Strî nabin..  
Dest û tilêt zarokêt me xwîneloken(9)  
Evca demê êvariya..J'aqarî(10) tê  
Dê sirûda aştiyê bê  
Bêrîvanêt gundê me jî  
Şûna şikefta  
Dê l'derê xanîkê ava  
Meşkêt xwe kên(11).

## 1)- Çerîn: Çerîn

(2)- Le'lîxana Goveyi: Çirokeka folklorî ye.  
Hesemaxa ji Lelîxanê hez dike lê jînbaba wî bi xedir  
Lelîxanê li kurê xwe mar dike. Dema Hesemaxa pê  
diheze din dibe û bi çola dikeve, piştî heft sala  
rojekê Hesemaxa rastî Lelîxanê têt, dema Lelîxanê  
wî nas dike jê re dibêje; ez hîn ya te me lê Hesemaxa  
dibêje Lelîxanê ew rezê xelk çûye nav, min navêtin  
ji iro pêve.

(3)- Perixîn: Mizdan

(4)- Rîs: Tazî

(5)- Nehal: Newal

(6)- Kevi: Dema baharê berf dihele, lepek berf  
wek pînek di nav reşayiya çiya de dimine, ji viya re  
Kevi tê gotin.

(7)- Xurîn: Dengê ku şer derdixe, wek zûrîna gur.

(8)- Perasi: Perasû, parsu

(9)- Xwînelok: Naprûk, dirandin

(10)- Aqarî: Çündîna bostan, rez, baxçe bêriya ji  
gund dûr re divêjin: Col.

(11)- Bikiyen, bikulin.

Helbesta Feqiyê Teyran, di hejmara berê de bi  
gelek şasîti derketibû. Di vê hejmare de em we  
rast dikin û ji nûve çapdikin.

Armanc

Ji klasîkîn edebiyata Kurdi:  
Feqiyê Teyran

"EZ"

İro ji dest husna hebîb  
Serkeste û heyran im ez  
Min eşq û muhebet bûn  
nesîb  
Sewadê sergerdan im ez

Eşqê gelek sewda kirim  
Bê mal û bê mewda kirim  
Nûra çira winda kirim  
Mûsayî Imran im ez

Mûsa ji dest husna bi nûr  
Şérîniya xalêni di hûr  
Secde bire ber Kohê Tûr  
Nêzîki remzê wan im ez

Remzê ku dê dîlber bikin  
Carek bi çesman seyr bikin  
Dê Kohê Qaf ker ker bikin  
Mecrûhê pir-kovan im ez

Min ah ji dest kovan û  
gehran  
Min sebir nayet li sehran  
Şubhetê mewcîn di behran  
Qazemê umman im ez

Qazem û behrîn di heftê  
Agirê eşqê ku keftê  
Dê bisojoit şubhê neftê  
Min diye, pêzan im ez.

Min diye muhbet ci reng e  
Sohtime doja pir-ye'ke  
Min mudam dil jê behing e  
Bi nalîn û efxanîm ez

Nalîna teyr û tyûran  
Kâlîna çeng û bilûran  
Xulxûlîn li qesr û quşûran  
Bulbulê xoşxwan im ez

Bulbulum daîm dixwînim  
Ez yeqin ez te bibînim  
Dîn dibim sewda dimînim  
Serxoş û sukran im ez

Serxoş û ebter kirim  
Te ji illeta rengzer kirim  
Te sotim ker ker kirim  
Tu agir û buryan im ez

Agir û pêta di dil da  
Me'neyan daxan ku hilda  
Ew kitap naçit du cilda  
Hafizê medhan im ez

Hafizê medh û pesandan  
Rohniya mehbûb û rîndan  
Bê hisab werbûn di findan  
Sofiyê bê can im ez.

Sofi me qet qet û narîn  
Kuştî me derb lê diyarin  
Min demek sebr û qerar in  
Nexwêşê pir-jan im ez

Nexwêşê reng lê nemayî  
Dest li ser falê nihayî  
Wan digot ji çavê giyayî  
Kûştiyê e'yanan im ez

Kuştîme herdû iyûnan  
Yan ki yêd nisbet ji nûnan  
Radiket ew qetl û xûnan  
Girtiyê zindan im ez

Girtî me insaf demîrin  
Qadî û muftî vebîrin  
Qeyd kirim kes bê xebîrin  
Bendeyê hicran im ez

Ma di benda firqeta te  
Canfidayê xidmeta te  
Da bibînim rehmeta te  
Nobedarê xan im ez

Nobedarê qelehê xwe  
Dergevanê dergehê xwe  
Bîne bîr û agehê xwe  
Tûleyê asitan im ez

Tûleyê dergahê yar im  
Şev û rojan nobedar im  
Westayê der intîzal im  
Çavriyê Sultan im ez

Çaveriya sira li pêş im  
Meqsedâ ezlî feniş im  
Hicretâ Yûsuf dikşîm  
Ya'qûbê Ken'an im ez

Kor e bo Ye'qûb ji dinê  
Ji perdeya daxa evinê  
Ger diben veke birînê  
Hewcîyê Lokman im ez

Wan digot Lokman tebîb e  
Gote min xef e'ndelîb e  
Şafiyê derdan hebîb e  
Pê bawer û iman im ez

Sond dixwim sa'd û destan  
Kevir û seylêd li bestan  
Min bixom li curhan  
Bê bestan

Bê rahet û asan im ez

Eşqa rahetiya kêm e  
Agir û pêta dilê me  
Çend hezar medhan dibême  
Muhîtê esman im ez

## Pencere

## Mueyid Teyib

Helbest Kevintirin  
Hunerê Zimanî ye

Ziman jî her zîndiyekî di jîna xwe de, di çend  
qonaxan re derbas bûye, yan derbas dibe. Bi  
peyvek din; ziman jî jî dayik dibe, dibe zarok û  
xurt dibe û gelek ziman jî kal dibin paşê jî  
dimirin, yan jî li cîyê xwe radîwestin. Ü ev  
rawestîyan jî, rengek ji rengê mirinê ye.

Li vir çend pirsyar dikevin serê mirov: gelo  
ziman di her qonaxek ji van qonaxan de bi ci  
awayî bûye? Erk û karê wî ci bûye? Peywen-  
diya wî û helbestê çiye? Ü helbest kengi peyda  
bûye?

Ji bo bersîva van pirsyara divê em vegerin ser  
vekolînê dîroka ziman(i), emê bibînin ku wê  
çaxê ya ku mirov nêzîkî hev kiriye û civak pêk  
anye, hest (şuûr) pê kirina ku pêwîstiyâ wan  
bi metodekê heye, ku di hev bigîhê. Wê demê  
wan gewriya xwe bi kar anîn û deng jê der-  
xistin. Ew deng roj bi roj pêtir (bêtir) lê hatin û  
êdi ew deng bûne peyv û peyv jî bûne hevok û  
ji hevokan jî ziman pêkhat.

Helbet ziman di vê qonaxê de gelek sade bû  
û peyvîn wî ji sinûrê navên tiştîn berbiçav  
derbas ne dibûn. Lê piştî demeke dirêj peyvîn  
nû ketin zimanî. Wan peyvan karibû behsa  
bîrhatînê xwe bikira yan navê hin tiştan  
bigota ku ne li berçav bûn. Di vê qonaxê de  
şoreseke mezin di zîmîn de çê bû û guherînê  
pirmezin bi ser erkê zimanî de hat. Ew guherîn  
jî ew bûn, ku heta wê çaxê xelkê ziman bi kar  
dianî ji bo ku tenê pêwîstiyê xwe yê maddî  
bi ci bîne; weke ku bêje: ez birçî me û xwarinê  
bixwaze.

Lê piştî vê qonaxê erkê zimanî berfireh bû û  
êdi ji bo bi ci anîna pêwîstiyê rojane jî ziman  
bi kar anîn. Ji bo ku ev guherîn baştîr xuya  
bibe, mirov dikare nimûneyekê bîne; dema  
mirovek bi rî diçe û yekî din govendê digre, di  
her du haletan de ji ew mirov endamên laşê  
xwe bi kar tîne, lê her yek ji bo armancekê ye.  
Di haletê pêşîn de, laşê wî mirovî dîlivîne ji bo ku  
xwe ji ciyekî veguhêze ciyekî din. Lê di haletê  
duduyan de ew mirov laşê xwe dîlivîne ji bo  
awayekî ciwan û ew ciwanî ji hunereke ku  
dibêjinê govend û armanca wî ji ji govendê bi  
cikirina pêwîstiyekê rojane ye.

Wesa jî guherîn dikeve zimanî, dema mirov  
di peyve weke ku mirov bi rî biçe û dema mirov  
helbestekê dixwîne weke ku mirov govendê  
bigre. Belê helbest weha peyda bûye û bi vi  
awayî bûye. Helbest kevintirin û bilindirin  
hunerê zimanîye. Piştî helbestê pexşan (nesir)  
derket lê heta niha jî dema pesnîn  
pexşannivisekî tê dayin, dibêjin; zimanî wî  
zimanî helbestê ye.

Xwezi min sed ser hebûna  
Sed hezar dev pê ve bûna  
Ew hemûl medhîn te bûna  
Hêj bi wan niimsan im ez

Ez kiz û zer bûm ji qehrê  
Dê devik çibket ji qehrê  
Yan du çav çibkin ji schrê  
Bê dîtina eynan im ez

Sed hezar çav min divêna  
Bayekî perde hilêna  
Xet û xal min tê bidîna  
Eşqe-quş can im ez

Her kesê eşq tê eser kit  
Sed hezar perdan li ber kit  
Hemuyan dê ker bi ker kit  
Tazi û uryan im ez

Perde çû ez mame tazi  
Dil sirra mehbûb dixwazî

Min ibadet eşq û bazî  
Bê mey û meyxan im ez

Xaniya bade û mey tê  
Muxnî yû hem çeng û ney tê  
Min ji eşqan heye-heye tê  
Serxweş û sukran im ez

Serxoşê ava heyatê  
Meclisa reqs û sematê  
Dê ci kim bi sewm û selatê  
Bi kûze û fincan im ez

Ew meyê gerden dirêjan  
Şîşe û wan baderêjan  
Min nema hiş li nîvêjan  
Li deftera dînan im ez

"Mim" û "Hê" aqil vederda  
Sicleya eşqê û derda  
Lew qelem anî bi serda  
Me'fûyê xufran im ez.

# MOLCILEY Û DEVEY

Arêkerdox: Koyo Berz

Molciley qandê zimistanî xo rê werd arê kenê. 'Erdan mîyan ra, ciwênan sera xele, mercûy, korêk, cew û koşni arê kenê, benê kenê qulda xo mîyan û zimistanî xo rê we-nê. Simerê ci jî qulda xo sero arê kenê pê ser ki yaxero (varano) ki vareno, qulda ïnan ra nêşiro war, zereyê qulda ïnan hî nêkero û çiyê ïnan xo ver nêbero. No sime-ro ki çorşmeyê qulandê molcilan dir o, no nêverdano awa yaxerî şiro zeredê qulda molcilan. qandê coy molciley nê simerî çorşmedê qulandê xoya arê kenê pê ser û çorşmeyê qulandê xo hemi simera gênê.

Hergi roj devey yenê, nê simerê nînan çorşmedê qulda nînan di wenê û şinê. Molciley devan rê vanê:

- Birayê girdî, meyerê si-merê ma mewerê!

Devey vanê: - Ma kotî ra birayê şima benê, ma yenê simerî wenê.

Molciley vanê: - Neya tepe-ya şima bîrê simerê ma bûrê, ma do jî geryê şima girdê şima heti bikerê.

Devey vanê: - Şima şinê kê rê geryê ma kenê bikerê, ma şima ra nêtersenê û ma do timûtim bêrê simerê şima bûrê.

Molciley vanê: - Winî yo? Wa zey şima bo, bahdo beli beno kam poşman beno û qenda xo sero roşeno.

Beno roja bîni, fina devey yenê û simerê molcilan we-nê. Girdê molcilan şino girdê devan heti û girdê dêvan rê vano:

- Reis Beg, deveye to yê yenê, simero ki qulandê ma sero, ê yê ey wenê. Ti devanê xo tembe ki, wa fina nîrê simerê ma niwerê.

Girdê devan vano: - Wenê wenê, se beno?

Girdê molcilan vano: - Senî wenê wenê se beno? Heme çî beno, ma yê ci rezileya û simerî arê kenê û fekdê xoya anê çorşmedê qulandê xo di kom kenê, şima yê jî reha-teya këfdê xoya yenê û wenê. No simer nêverdano awa yaxerî zimistanî bîro qulandê ma mîyan.

Girdê devan vano: - Wa qe xo rê bûrê, hetan zimistan şima bol fini arê kenê.

Girdê molcilan vano: - Ma no karê qeçkan o? "Fina arê kerê, fina arê kerê", ma ma rê gan lazim niyo, ma rê rehatay lazim niya? Ma yê ci rezileya qîş û qalî mîyan ra arê kenê. Wexto ki ma kewnê qîş û qalî mîyan, cin û cinawirê wîcanan ma tepşenê û wenê. Ma yê nê simerî sehatana rayda dûrî ra xo feka anê.

Girdê devan vano: - Şima bolî yê, şima bûrê jî şima bikişê jî şima nêqedênen. Jew-jew ci rê vanê "zey molcilan o".

Girdê molcilan vano: - Ez o to rê rîndaya û camêrdeya

vana, wa fina nîrê û simerê ma nêwerê û tijî qiseyê qurey meki.

Girdê devan vano: - Ti rîndaya nêvajê do se bo, devey bîrê simerî bûrê şima do se kerê?

Girdê molcilan vano: - Fina bîrê simerê ma bûrê, ma zanê ma se kenê!

Girdê devan vano: - Ma bîrê şima do se kerê? Ma hergi payêda xo bin di pansey teneyê şima pay kenê û kişenê 'erdî sero kenim zey cili.

Girdê molcilan vano: - Winî yo? Wexto beli beno kam kî keno zey cili. Wexte ci bîro beli keno, şima senî pansey teneyê ma xo payan bin di verdanê û kişenê. Ez o fina şima rê qiseyê xoyê bahdo-yînî vana, wa fina nîrê û simerê ma niwerê. Wa no qiseyê mino verniyin û bahdo-yin bo. Şima rê vana, şima do bahdo bol poşman bê, do şima dest nêkewo. Şima do na mesela ra bol û bol zerar bîvinê û zey kuwarîya 'erd kewê.

Girdê devan vano: - Şirê destbereya şima çîci yena bikerê, destbereya şima yena se pey di meverdê, ma şima ra nêtersenê û ma ê xoya kenê!

Girdê molcilan vano: - Mi qiseyê xoyô bahdo-yin kerd, bohdo do beli bo.

Dano piro yeno, 'esîra xo arê keno pê ser û ïnan rê vano:

- Heme şirê binê 'erdî aşanê û 'erdî bin di erqî û hendeqî virâzê wa riye 'erdîyo tenik bîmano, wexto ki devey yenê simerî ser, do nê erqan û hendeqan mîyan ro kewê, erqan û hendeqan mîyan di nêşenê xo bilûnê û werzê pay, ma do wexto arê bîyê çimandê nînan, çimanê nînan vejê û kori kerê. Wexto û do bîvinê dinya çend koşey o û sîyayî û sîpiya seni pê ra abîryêne.

Molciley pêro şinê û binê 'erdî aşanenê, erqî û hendeqî virâzenê. Riye serdê 'erdî tenik verdanê ki beli nêbo. Devan rê faqêda weşîronanê. Bahdo jî şinê bol simer anê çorşmedê quli ra û nê riye 'erdî tenikî sero kom kenê, şinê kewnê a qula ki simer çorşmeyê ci di çinîyo û erqî û hendeqî tey nêvirastê.

Devey fina yenê winêne ki qulan sero simer biyo bol, şinê veyn danê enbazandê xoyê bînan û vanê:

- Hadîrê hadîrê, ma şirê, molcilan simer kerdö bol, mîrdiya ma hemini simer esto, ma mîrdiya xo bûrê û pîzeyê xo zey niqaraya kerê.

Keylê devey danê piro yenê ki mîrdiya xo simer bûrê. Molciley winêne ki devey ê yenê, xo nimmenê. Girdê molcilan vano:

- Wa herne kes cayê xo bigiro, devey ê yenê, nika gamma ê do feqda ma mîyan

kewê. Xo hadre kerê ki şima pêro finê ra devan ser kewê, çimanê ci vejê û kori kerê.

Molciley pêro cayê xo gênê. Devey yenê simerî ser, hergi deve kiştê ra hêrişê simerî keno ki xo rê ca bigiro. Seni yenê simerî ser, 'erd bin di yeno war û new-des devey kewnê erqan û hendeqan mîyan. Bi çapikeya molciley şinê û are benê çimandê devan. Qîjînî û qorî kewna devan ser. Jew-didîyê devan pey ra manenê, xo nêresnenê simerî, winêne ki qîjînî û qorî kewta enbazandê nînan, winêne ki enbazê ci pêro kewtê hendeqan mîyan û yê nêşenê xo bilûnê, hema şinê xeberi danê girdê xo û vanê:

- Reis Beg, Reis Beg, molcilan ma rê feqi ronaya, enbazê ma pêro kewtê hendeqandê molcilan mîyan.

Girdê devan, devan pêrini arê keno pê ser û yenê quâlandê molcilan ser. Molciley winêne ki girdê devan tewdê 'esîrda xo pêroya yeno, girdê molcilan molcilan rê vano:

- XO binimnê û cadê xo di zey şerî bipawê!

Molciley pêro xo nimmenê û cadê xo di zey şerî pawenê. Girdê devan yeno û veyn dano:

- Molcileyenê, molcileyenê! Şima çirê wina kerd, şima çirê bêbextey kerdî?

Girdê molcilan vano: - Ma se kerdö? Ma çirê bêbextey kerdö? Ma şima rê va, şima goş a ma nêna, şima va "ma payedê xo bin di pansey teneyê şima verdanê û kişenê". Ma şima rê qiseyê xoyê verin û bahdo-yin va, şima ma piyase di nêhesibnay û goş maya nêkuwa. Şima tim va "ma kişenê", bîrê, şima do senî bikişê se bikişê? Şima va "nika ma girdi yê û jewdê nînan hendê nengûyêde ma nêbena". Şima va "ma girdi yê, ma qedê nînan benê", no girdê û werdiyeyê nîyo, no bi aqil û jewbîyayena wo. Kes aqil bo û jew bo, dînyay herûn ra qilayneno û kes nêşenê paştiya ci biyaro 'erd. Şima wazanê ma lejê xo bîdomnê, nê zî şima wazanê ma bîrê werey û merhaba bikerê. Şima kamcîni wazanê biwazê, ma hadre yê. Ti vajê "ma lej bikerê", ez do veror enbazê toyê ki ma dest dir ê, ez do ïnan bikişâ. Ti vajê "ma merhaba bikerê", ez do ïnan nêkişa û teslîmê to kera. Wirna rayan ra raye bîvîjni, kamcîn wazanê ti zanê.

Girdê devan vano: - Enba-zanê ma mekişê, enba-zanê ma vira dê, ma şima di lej nêkenê, ma do merhaba bikerê, ma do neya tepeya dostê pê bê. Ma fini paşti girdeya nêgirêdanê û karo wina nêkenê.

Girdê devan vano: - Enba-zanê ma mekişê, enba-zanê ma vira dê, ma şima di lej nêkenê, ma do merhaba bikerê, ma do neya tepeya dostê pê bê. Ma fini paşti girdeya nêgirêdanê û karo wina nêkenê.


Girdê molcilan vano: - Wa

bo.

Ü emir dano, vano:

# ZÛRKERO GIRD KAM O

Laser Sêwrekij



"Tirkiye o yo bi lez vera vernî şino... Fina sîftî, verê ney çend rojî tiyareyê F-16'ê ma ezma-nandê ma di pera. Ma firqateyni (gemîyênda herbî-Laser Sêwrekij) Almanyaya Rojawanî ra erîna. Qandê "rokettataranê lûlîdergan"(uzun namlulu roketatarlar) jî ma yê girweyenê..."

Nê qisey, Turgut Ozal'î roja 27-10-1987 di televîzyonê Tirkiye di programê "Miyandê Karûbarî ra" (icraatin içinden) di kerdê. Program di qalê çidê bîni jî kerd, feqet giraney da ser malzemeyê eskerî.

Zeki yeno zanayış Hukumatê Tirkiye her meng nî programî bixo virazeno. Her program di Turgut Ozal qelema xo keno xo dest, weynêno çimandê goş-taran ra û mîrdiya xo zûrî û demagoji keno. Jewî des mus-neno. Reqemanê ekonomî go-reyê xo vurîneno.

Vîst û hewtê na meng di jî Turgut Ozal'î fina bi "ziwandê nerma" dest bi qisandê xo kerd. Ozalo zûrker, winî payeyê xo û hukumatê xo dano ki jewdo ki nêzano o do vajo qey tarixê Tirkan 1983 di dest pa kerdö.

Halbiki çiyo ki hukumatê Turgut Ozal'î keno, sere ra heta nika bi sayedê cuntaya faşist o. Ow (û) hukumat bixo parçeye yendê (leteyêndê) rejîmî yo. Turgut bi zûrana nêşeno xo Cuntaya 12'ê Eylüli ra dûrî fino.

## ARWÊŞI

Cin û cinawirî mîyan di en tersinokê ci arwêşî benê. Mar xuşeno arwêşî remenê, her zireno arwêşî remenê, ga qoreno arwêşî remenê, kutik laweno arwêşî remenê... Çiçi xo lûneno arwêşî remenê.

Rojê arwêşî pêro arê benê pê ser, vanê "no dinya di ma ra tersinok kes çinîyo, en tersinokê nê dînyay ma yê; ma hîndayê tersinokî yê, hadînê ma pêro şirê xo çekerê dolî mîyan, ma pêro bifetisîyê û nê tersî ra bireyê!" Nê danê piro şinê ki xo çekerê dolêdî lîminî mîyan.

Yenê nezdîdê dolî ki xo çekerê dolî mîyan, winêne keseleyê ki teberdê dolî di xo dayo vareraj (fîjî ver). Ê keseley pêro finî ra tersandê arwêşan ra rap rap rap xo erzenê dolî mîyan û tersan ra xo dolî mîyan di nimnenê.

Arwêşî vinderêne, vanê "nê keseley ma ra tersay xo eşt dolî mîyan û xo dol di nimit, zey ma tersinokî dînyay di bolî yê, ma çirê xo çekerê dolî mîyan û xo bifetisînê? Hadîrê, ma pey di şirê, ma xo nêyerzenê dolî mîyan."

Pêro danê piro fina pey di ageyrenê û şinê 'erdan mîyan ra benê vilay. Keyrdê kesan erwêşî kiştenda xo ra reyênê.

Sûki,

30-10-1987

Ü emir dano, vano:

## ji xwendevanan

### VATİNYE N CIWANEN KURD LI HUNDUR Ü DERVAYE WELAT

Meriv carna li dora xwe û cihanê dinêre ku em ciwanen Kurd di çi rewşê de dijin û çima wiha şunde manin. Piranî em nezan ma ne, bi rastî me ne - zan hîstine. Heta em bindest bin emê hin ji pirr şunde bimîn.

Diroka gelê Kurd ji wek diroka gelê cihâne freh û dîrêje. Pîr gel wek gelê me bin dest bû, lê belê iro gelej ji wan gîhistine azadiya xwe û yêmanin jî ji bo rizgarîya xwe têkoşinî didin. Rizgarbûna welateki li ser şiyarbûna gel e. Gava gelek nezan mabe, yan jî nezan hîstibin, ew gel zû bi zû şîyar nabe û barêngîran li ser milê me, keç û xorten ronakbir û zana ne.

Xebata me wê ji gelê me re bibe tîrêja rojê û ev tîrêj wê di na-va çiyayen Kurdistanê re li ser gelê me bîke ronahî. Ger em li Kur-

distanê bin ger li wela-tén biyanlyê bin, dibê em çanda xwe, zimanê xwe pêşve bibin û kovarû pirtükên Kurdî bixwînin û bi-din xwendin. Xwendin û nîvisandina Kurdî li ser milê me keç û xorten pêşverûne. Ji alî din ve ji pê-wist e ku em bi dora xwe re, bi bav û diyen xwe re, bi xuşk û bîra-yen xwe re bi zimanê xwe bipeyvin. Em bi xwe, bi zimanê xwe baş hînbîbin.

Van rojên dawiyê em yekîtiyê di navbera partiyen Kurdan de dibinin û em pîr pê kîfxweş dibin. Gotin-ek me Kurda heye dibê "Destê bi tenê deng jê nayê" ev gotin bê sedem nehatiye gotin.

Pîr kesji me van tiştan zanîn, lê bikar naynîn ev jî kîmasi-ye herî mezîn e.

Ji sala 1976\*an heta 1979'a li Kurdistanê Tîrkiye bî pêşen-

giya DDKD û hin ko-melê din gelê me gelek pêşde çû, kovar û rojnamen Kurdî di nava gel de hate belavkirin, xebatkar û zahmetkêşen Kurd ew xwendin û di riya xelasîyê de pêşveçûn çebû. Mîtingehkaran mîzî kirin ku di nava sê, çar salan de pêş-veçûneke mezin heye, ew ji vê pêşveçûna gelê Kurd tîrsîyan û loma di payîza 1979' an de DDKD qedexe kirin û komelê wan gîrtin. Pişti 12 ilonê bi sedan endamê wê avêtingirtigehan. Weke hîrç û hovan êriş birin ser gelê Kurd bi seda kes hatin kuştin, zîlm û zordariyê mezin li wan kirin.

Wexta mîrov zana be kîmasiyen xwe hîn baştıribîne û di kare wan kîmasiyan kîm bîke.

ZANA  
Freidenstadt  
Almanya

### JI REDEKSIYONA ARMANCE RE

Ev cara yekemin e ku ez Armancê ji "serî heya bîni" dixwînim. Min weke zahmetiyekê dabû ber çavê xwe, lê min xweş xwend û qedand. Tiştê ku ji min re zor hat, an ku mi weke kîmahîyêkê dît ev bû:

Nîvisen we i bi dûma-hîk di nîvî gotinê de û di nîvî stûnê (spalt) de qut dibin. Bi min ne tiştikî

xweş e, heta mîro dû-mahîk dibine mîro qala nîvisê jîbir dike. Belki ev kîmasiya çap-xanê be, an zahmetîke teknîkî be, lê eger bê rastkîrin wê geleki xweş bîbe.

Geleki xweşê ku roj-namake Kurdî, ku ne tenê nav, lê naverok ji bi Kurdî ye heye, serê min geleki pê bilind e û ga-veke pir mezine di warê

pêşketina edebiyata Kurdî de. Delileke pir başe ku mîrov kare bi Kurdî çap ke.

Weke ku we ji daxwaz kîrîye, eger helbestek, nîvisek an qiliyekî min hebe ezê ji were bi kîf û xweşî rîkîm.

Ez sersala we a 88'a ji dil û can pîroz dîkim û serketina we dixwazim!

Cevher Battê

### PIRSA KURDA DI SEMPOZYUMA...

Siyaseta ku li dijî Kurdan berdewame Kurdistanâ Tîrkiye paşa hîstiye û ew kiriye rewşa mîtingehiyê. Di van deh salen dawiye de di encama (netica) pêşketina aboriyê de kapitalizm li Kurdistanê pêşde çûye, di civakî de guherandin anîye û karkeren bajar û gundan gelék bi pêşxistiye.

Di termolojiya fermî ya Tîrkiye de navê Kurdistanê "Herêma Rojhelat" e û hukûmetê tedbirîn usa sitendine ku, ji bo sermaye xusûsi ev herêm raxbetê nabîne. Ji bo sermaye xusûsi talankirina dewlemendiya Kurdistanê bi sermeyedarêni biyani re di metropolan de bikaranîn him hîsaye û him jî bi menfeet e. Ev siyaset sedemê tevaiya surgûnkirina Kurda ye"

Li ser netewayetiya (mîletbûna) Kurda Radoy Krastev digot "Hemû sertên Kurda hene ku bibin netewe, Kurd netwene û di bin asîmlasiyon û qatlaman de ji netewetiya xwe diparêzin"

I. Yalimov li ser Kemalizmê û serîhildana Şêx Seîd tiştîn rast digot. Yalimov digot ku "Sedemê ku heta iro serîhildana Şêx Seîd wek

"îrticâi" hatiye nîşandan xeletiya PKT (Partiya Komunist a Tîrkiye) ye. Wek ez zanim ev dîtin ji alî Şefik Hûsnî de pêşniyarê Kominternê bûye û ji ber ku ev serîhildan li dijî Kemalizmê ye divê ku paşverû be. Serîhildana Şêx Seîd wek serîhildanêk paşverû ketiye literatura Sovyetê û a me (Bulgara) sedemên vêya ji serekên PKT di wexta xwe de agahdariyên (informasyon) ne rast û çewt dane Kominternê. Bi dîtinâ min, Serîhildana Şêx Seîd pêşverû û netewî ye û ez bi "pêşverûtiya" Kemalizmê re ne hemfîkî im."

Sempozyuma Turkologan bi kîmasî û çewtiyên xwe ve be ji, gavek pêşde ye ji ber ku li ser pîrsa Kurda bi dûr û dirêjî diaxîfîn û dîtinê xwe eşkere dikin.

Li ser van dîtinê B. Dimitrova pîrsa Kurdan di

sempozyumê de bû pîrsa yekemin û hemû mecbûr dîtinê xwe li ser Kurdan bêjîn.

Roja duyemin munaqaşesi li ser Kemalizmê û netewebûna Kurda bû. Pisporênu ku li ser wan pîrsan axiftin, hemuya bi kurtî gotin ku, Kurd netawê ne û Kemalizm jî di dema Komara Tîrkiye de berdewama hin fîkrîn şovenî ye, ku di Împaratoriya Osmanî de hebûn.

Li ser netewayetiya (mîletbûna) Kurda Radoy Krastev digot "Hemû sertên Kurda hene ku bibin netewe, Kurd netwene û di bin asîmlasiyon û qatlaman de ji netewetiya xwe diparêzin"

I. Yalimov li ser Kemalizmê û serîhildana Şêx Seîd tiştîn rast digot. Yalimov digot ku "Sedemê ku heta iro serîhildana Şêx Seîd wek

### Destpêk r. 4

### Di programen partiyen cepê Tîrkye...

Tesîra Kemalizmê û tirsa kolonyalizmê roleke mezin dileyize (dilize). Wexta ku behsa sîyase-ta derva dibe bê istisna herkes mafê çarenûsi diparêze. Kolonyalizma Emerîqa, Efrîqaya Başûr û ya Fransa rûres-dikin. Lî wexta ku dor te Kurdistanê bêdeng dibin, tiştîn ku ji bo gelên din dibêjîn, di ci de ji bir dikin.

Nîzanîn ku li gor sînorê burjuvaziyê kolonyalist tu carî şoreşgeri nabe. Dibê kesen şoreşger ji bo nêrîn ilmî her tiştî bigrin ber çavê xwe. Çepê Tîrka, bi taybeti ji di platforma legal de heyânuha îmtihaneke baş nedane.

Carna hin tiştîn ku li ser mese-laya Kurd û Kurdistanê hatine gotin ji, bi xera têkoşina şoreşger û welatparêzên Kurdistanê bûye. Bira çepen Tîrka di vî wari de pesnê xwe nedîn. Çimki her tiştî li ber çava ye. Di pêşniyara programma Partiya Yekbûyi a Komunistî Tîrkiye de tê gotin ku, di qebül-kirina meselaya Kurdî de her du partiyen ku bîyara yekîtiyê dane rolek mezin listine. Ev ne raste. Munaqaşeyen ku deh panzdeh sal in domdikin berçav in.

Ji alî din wexta ku, em civînên, ji bo partyeke legal û sosyalist hatine çekirin bînîn bîra xwe, meriv dibine ku li ser meselaya Kurdî tiştîk

nehatiye munaqaşekirin. Halbuki meselaya Kurdi di nav sînorê dewleta Tîrkiye da meselake esasiye. Bi inkarkirina vê meselê, şoreşgeri û sosyalist nabe. Wek tê zanîn civînek di meha Tîrmeha 1986' an de li İstanbul bû. Guhderê ji kesen ku mese-laya partiya sosyalist munaqaşî dikrin, meselaya Kurdî pîrsi. Bî Y. Kuçuk, hemuya (M. Belge, D. Perinçek...) reaqşyonek mezin rî dan.

Meseleya ronakbirê mîrxas İsmail Beşîkçi ji tê zanîn. Wexta ku Bêşîkçi ceza xwar, ji ronakbirê şormezin deng derneket. Di ser ra wext derbas bû, cezayê Bêşîkçi hindîk ma, hîn hînek kovar û roj-naman dest bi mese-laya Beşîkçi kirin. Ev behskirin ne işaretâ guhertina nîrina kovar û roj-naman bû. Ji bo ku di wê demê de burjuvazî bi xwe ji behsa Kurda dikir. Ronakbirê şormezin di wextek wusa de derketin mey danê.

Nuha mesela Kurdî di nav hînek kovaran de bûye işaretek "tûjîyê" (şaretîk mîraniyê, ce-saretîk)". Lî şasîtiyên dîroki hîn ne qediyane. Ji gelel aliyan domdikin. Misal pîrsi in. Heta ku tesîra Kemalizmê û tirsa kolonyalistan li ser hîz û partiyen çep û sosyalistên Tîrkan he-

be şasîtiyên esasi wê dom bîkin.

Van tiştana ji rî (nîşan dide) dide ku di mesela Kurdî de şasîtiyên çepê Tîrkan Pîr in. Wexta ku di têkoşinê de illegal in tesîra Kemalizmê û nedîtinâ rastiya Kurdistanê heye. Wexta ku legal (serbest, esker) in ji, ji derî van her du sebebân tirsa kolon-yalistan ji tesîrekî di-ke. Üwusa şasîtiyên dîroki dom dîkin.

Ji iro şûnda ji ji bo ku çepen Tîrkye ji şasîtiyân bîn dûr xîstin, wezifeyek mezin dîke-be ser milê hîz û partiyen Kurdistanê.

Ji iro û pê ve, ji alîki ve xurtkirina têkoşina netewî û cîvakî û ji alîki din ve ji rexneyen di ci de ku karibe di warê dûrxdîstina ji şasîtiyân de roleki ba bileyize. Ev wezife, ji bo xurtkirina yekîtiya têkoşina gelên Kurdistanê Tîrkiye ji gelek gîring e.

(\*) Programen Tîçsf, Tsekp, Tsp, VP, Tîp (herdû program), TSîp, TEP, SDP, TKIP û pêşniyara programma SP di kovara "Saçak" de, di hejmarê Çîrya Pêsi û Çîrya Paşa 1987'an de hatine weşandin. Pêşniyara programma TBKP ku dertê li ba meye, nîvisandina daktîloye ye.

### Hilbijartina diktatoriye...

Ku ne wiha be ew, li herêmekê ar bajareki ji %100'â dengan ji bistîne parlamente dername û dengen wê vala diçin. Berî hilbijartînê 29'ê Çîrya Paşa, partiya Turgut Ozal bendeke din ji xist pêşîya partîyan ku ew ji benda bajaran bû. Li gor wê ji, partîyek ji bo ku karibe li bajareki parlamente derxe, divê li wî bajareti tevaiya dengan li jimara parlamente û bînîn bîra xwe, meriv dibine ku li ser meselaya Kurdî tiştîk

### Konferans li ser surgûnkirina Kurda

Kurd, Tîrkye û Danîmarkî ve bi hawakî pîrsi balkêş hat guhderîkirin. Di dawîya konferansê de nûneren Partiya Komunist a Danîmarkayê û Partiya sosyalistên Çep a Danîmarkayê ji axiftin, surgûnkirina Kurdan ji welatê wan bi xurtî protesto kirin. Ü her wisa, li dijî zulm û zora ku li Tîrkiye li kes û hêzên pêşverû û komunîst dibe derketin, van kirinê diktatoriya generalen faşist mahkum kirin. Pişti vê, Dr. Kemal Fuad û Malmîsanij bersivîn pîrsen guhdarân dan. Konferansê ew sur-gûnku ku iro li Kurdistanê têne kirin bi awakî sert mahkum kir û di vî warî de hin bîyar gîrt.

Axaftivanê Konferansê yê din Dr. Kemal Fuad ji pişti ku bi kurtayî qala sur-gûnku Kurdistanâ Iranê kir, dûre bi dûr û dirêjâhî li ser sur-gûnku û demen dawî de li Kurdistanâ Iraqê dibin, sekînî, di vî warî de gelek numune û istatistikên hêja pêşkêş kir.

Konferans ji alî guhdarân

# Têkoşîna aştiyê gava pêşîn a serkeftinê avêt

Peymana dîrokî INF hate ûmze kirin. Bi vê peymanê gavek dîrokî hat avêtin. Peymana INF di çekdaxistinê de peymana yekemin e. Herçiqas ev peyman hewqas ne fireh be jî lê ji bo aştîya dinê gavek girîng e. Yekîtiya Sovyet dixwaze bergê vê peymanê hîn firehtir bike.

Di navbera 7 û 10'ê çileya pêşîn çavê hemû dinê li civîna zîrvayî bû. Sekreterê PKYS Michaïl Gorbaçov û serokê DAY Ronald Reagan peymana INF ûmze kirin. Haziriya vê peymanê ji alî komisyonen her du aliyan ve hatibû amade kirin.

Li gor peymana INF'ê fuzyen atomî ku li Ewrûpa hatine bi cî kirin wê ji holê bête rakirin. Anglo nêzî 2000 mîsîlen atomî yê navînmenzîl û kurtmenzîl wê bêtîn imha kirin. DAY wê bi temamî 438 mîsîlan ji holê rake. Di navînmîsîlan de 188 roketên Pershing-2 û 72 roketên Pershing-1 ên Almanya Federal jî hene. Yekîtiya Sovyet wê 1575



M.Gorbaço û R.Reagan pişti imzekirina peymana dîrokî qelema xwe bi hev diguherînin

mîsîlanji holê rake. Piraniya van mîsîlan li ali Ewrûpa hatine bi cî kirin. Hinek ji van mîsîlan jîli çiyayen Ural, li Çekoslovakya û li DDR'ê

bî cî kiri ne

## Wê bêtîn îmhekîrin

Li gor peymana INF'ê armanc ne tenê ji holê rakirina mîsîlan e. Divê mekanîzma teqandinê û malzemeyen din ên bi van mîsîlan ve girêdayî ne bêtîn îmhekîrin. Anglo sîstema mîsîlan bi hemû tişîn xwe ve, wê di nav 3 salan de bi tevayî ji ortê rabin. Di wexta îmhekîrinê de mafê her du

aliya jî heye ku nûnerên xwe bişînin ciyê mîsîlan. Ji nuha ve ji bo her du alî jî 20 teftîş hatine bi rêxistinê. Mafê teftîskirinê pişti qebulkirina peymanê 13 salanwê dom bike.

Li gor peymana INF mafê Sovyet heye ku penç welatên Ewrûpi ku mîsîlen nîv û kurt menzîl bi cî kirine, basêwan teftîş bike. Mafê DAY jî heye ku basêwan li DDR û Çekoslovakîyê hene teftîş bike. Hem Sovyet û hem jî DAY mafê wan heye ku nûnerên xwe li avahîyen ku pirsên mîsîlan çedikin, besdar bikin.

Li gor peymanê, heger aliyek bikeve şikê mafê wan heye ku ji hewayê kontrolan bikin.

Peymana INF herçiqas ji ali R. Reagan hatiye ûmze kirin jî, heta ku ji ali Kongra DAY neyê qebul kirin wê neyê pêkanîn.

Îmze kirina peymana INF'ê ji alî hem dewletên endamê Pakta Warşova û hem jî ali dewletên endamên NATO'yê bi aweki başî hat qebûl kirin. Ji aliye din hemû hêzîn aştîxwaz û piraniya dewleten dinê kîfxweşîya xwe ji INF'ê re diyar kirin.

## BI MİLYONAN ZAROK JI BIRÇINA DIMRİN



Foto: Armanc (Ş.Adlig)

UNICEF, beşa pirsa zarokên dinê ya Netewêne yekbûyî berî têkeve sala 1988'ê, raporek bela kir. Li gor vê rapore, salê 14 mîlyon zarok ji ber nexweşîyen berî pênc saliyê ku ji birçibûnê peyda dibin û pê dimrin. Tenê di du rojan de ji ber nexweşîya virikê (diarcê) 20.000 zarok mirine.

Helbet zarok ne tenê ji ber nexweşîya virikê dimrin. Ji ber nexwişîya kesebê 2,9 mîlyon, ji ber sorikê 1-9 mîlyon, ji ber malarya mîlyonek û ji ber felcê ji 800.000 zarok di salekê de dimrin.

Li gor rapora UNICEF ê, sedema mirina zarokan raslerast bi xizaniyê ve

## LI FILISTİNÊ QETLİAMEK NÛ

Leşkerên İsrailî li Gaza, Qudus, Nabîlûs û bajarên din ên İsxalkırı Filistîniya gulebaran kirin. Heta nuha 53

Di destpêka meha Çileya Pêşîn da qamyoneke leşkerî ya İsrail, li Gazayê 4 Filistîni kuştin. Li ser vî yekî Filistîni li dij vê bûyerê mitîngek pêk anî û kuştin. Leşkerê İsrailî eriş dan ser Filistîniyan û wan gulebaran kirin. Ji bo protestokirina

erîşen leşkerên İsrailî dikandarên Filistîni yê li Nabîlûs û li Qudsê dikanên xwe girtin. Herçiqas leşkerên İsrailî zor dan wan ku dikanan vekin lê tu netice ji vê zordariya xwe ji negirtin. Xwendevanen Üniversita bir zeytê li Şerîa Rojava ketin boykotê. Di nav-

bera xwendevanen û leşkerên İsrailî de şer derket.

Li gor masmedya Ewrûpi heta nuha ji Filistîniya 53 kes hatine kuştin û dora 300 ji hatine nîrindarkirin. Te gotin ku potansiyela gele Filistîni pir bilind bûye û talûka liberxwedanek mezin pire.

Xuyaye ku siyonist roj bi roj dixwazin erdê dagirkirî fireh bikin. Ji bo vê yekê jî provakasyonan pêktin. Zulm û tadayiya li ser gelê Filistîni roj bi roj zedetir dîkin. Biryara Şaronê terorist yek ji van provakasyonan e. Şaron biryara xwe da ku mala xwe bibe Şerîayê.



Kortekî Filistîni di nav lepêñ leşkerên siyonîstan de li ber xwe dide.

## Sala navnetewî ya kesên bê xanî

Sala 1987'an jî alî organizasyona Koma Miletan ve wek sala navnetewî yê kesên bê xanî hatibû ilankirin. Ew pirsa kesên bê xanî di dinya me ya iroyin de derdeki li ser derdan e. Hema hema hemû dewleten cihanê ew pirs bi temamî helnekirine û iro li hemû welatan problema xanîyan heye.

Li gora istatistikên merkeza iskanê ku di liqê Organizasyona Koma Miletanda ye dibêje, iro li dinê jî 4 kesan yek, yan jî milîyarek kes bê xanî ye, di xanîyan wek holikan de û yan jî de taxên pirr qeblebilix de dijin. Ew pirs û gelş ne tenê pirsa welatên pêşketi û ku yê hindik pêşketi ne. Iro li Parisê 10. 000, li Londrê 13. 000 kes bê xanî ne, li Newyorkê navbera 60. 000 û 80. 000 kes li kûça radizin. Li bajarê Stembolê jî ji 2 milyon kesi zedetir di xanîyan holikan de rûdinin.

Nufusa dinê çığa zêde dibe pirsa xanîyan jî wisa pirr dibe. Welatên ku hindik pêşveçûne di sala 1985'an de nufusa wan 3. 7 milyar bû. Ew nufûs di 2000 sali de 4.8 milyar û 2015 sali ye de ji wê bigê 6. 1 milyarı û wê çaxê jî wê ji 10 kesi 8'ê wan li welatên pêşketine de bijin. Nufusa bajarên van welatanjî her sal teqrîben 51 milyon yan jî her roj 140. 000 kes li gora hesaba wê zêde bibe.

Jî ber problema xanîyan hinek nexweşî jî tê holê. Li gor lêkolînen ku çebûne nexweşîyen wek enfeksiyon, paraziti û werem ji kesên ku di xanîyan bê sihet de dijin çedibin. Bi van nexweşîyan li dinê her roj 50. 000 kes (pirani zarok) dimrin.

Lewend FIRAT